


### Yekitî paşa

Arşîvên kurdan tije pêşnûma, bername û hedefên li ser yekitiya kurdan û dijberê wê ne. Gotina ku herî zêde hatiye û tê şixulandin jî "yekitî" ye ku tayên porê me jî şaneyên xwîna me jî bi vê gotinê kemilîne, dikemilin lê yekitî... ***Mizgîn Ronak/R.2***



### Fêdeya xwendina bi deng

Xwendina bi deng alîkariya pêşketina zarokan dike û têkiliyên dê û bav û zarokan xurtir û geştir dike. Ji derî pêşketin û têkiliyan çend sedemên erênî, kelk û sûdgirtinê hene ku mirov ji zarokên xwe re pirtûkê bi deng bixwîne... ***Amed Tigrîs /R.5***



### Annus Horribilis

Annus Horribilis gotineke latînî ye ku ji sala 1891'ê û vir ve ketiye nav hin zimanên ewropî. Gotin ji bo sala bûyerên gelekî xerab tê de qewimî ne, tê bikaranîn û wateya wê ya herî nêzîk a di kurdî de "Sala Reş" e... ***Necat Ayaz /R.8***


# xwebûn

25-31 ÇILE 2021 HEJMAR: 58 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Neyaran kêfxweş nekin

Hefteya borî ji Tirkiyeyê şandeyekê serdana Iraqê kir. Şandeya ku serkêşiya wê wezîrê parastinê yê tirk Hûlûsî Akar û serfermandarê tirk Yaşar Guler dikir, du jê tumgeneral û fermandarê artêşa bejahî jî di nav de cih digirt, piştî serdana xwe ya Bexdayê derbasî Hewlerê bûn. Hevdîtin û mijara vê şandeyê yek ji rojeva sereke ya hefteyê bû. Di wê hevdîtinê de şandeya Iraqê bi aliyên tirk re li ser mijarên der barê 8 dosyayên girîng ên li ser asta ewlekarî, aborî, xizmetkarî, enerjî, av, girêdana xeta trênê, vîza û pereyên dabûn sekinandin û dosyaya kurdî hevdîtin kir. Ji bo li ser van mijaran gavên... ***Felemez Ulug/R.6***



*"26'ê meha çile 2015, Kobanê rizgar bû"*

*23'yê îlona sala 2014'an, çeteyên DAIŞ'ê êrîşî Kobanê kir. Zarokên kurdan ên cegerpola, 150 şev û rojî bi awayekî canbexşane li ber xwe dan. Hêzên dixwestin Kobanê bê dagirkirin, bi awayekî ji nava xwe têr digotin "Kobanî ha ket, ha dikeve" hesabê lehengiya kurdan nekiribûn. Lehengekî berxwedana Kobanî, roja 26'ê Çileya 2015'an wiha digot; "26'ê meha çile 2015, Kobanê rizgar bû, saet 3 kêm deh deqe". Ev roj ji bo têkçûna DAIŞ'ê bû destpêka dawiya DAIŞ'ê û hevalbendên wê.*

# Li zanîngeha Rojava mînaka yekemîn



Gelê rojavayê Kurdistanê bi sazî û dezgehên xwe ve, tevî derfetên kêm, dorpêç û ambargoya li ser, bi salan e li ber xwe dide. Li aliyekî hewl dide hebûna xwe biparêze, li aliyê din kar û barên sazîbûnê bi rê ve dibe. Belkî tişta herî zor di şert û mercên şer de sazîbûn û birêvebirina pergala perwerdeyê be. Cîgirê hevserokatiya zanîngeha Rojava Aram Hesen der barê zanîngeha Rojava de ji bo rojnameya me axivî. Aram Hesen têkildarî zanîngehê wiha got: " Zanîngeha Rojava di sala 2016'an li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li bajarê Qamişlo, hat damezirandin. Armanca wê..." ***Hevpeyvîna Bêrîvan Kayi /R.4***

KONÊ REŞ

## Ez ji beriya Mêrdînê me... *R.8*

## Vîna bedenên birçî

Tevgerên siyasî û civakî yên ji bo azadî û wekheviyê têdikoşin, ji bo gihiştina armanca xwe, mobîlîzekirina civakê û mirovan û bi taybetî li dijî zilm û zordariyê gelek amûrên têkoşînê pêş dixînin. Her wiha amûrên li dijî newekhevî, bêedaletî, mêtingerî ango bi giştî li hemberî dijminatiyê tên pêşxistin cur bi cur in. Ji têkoşîna bi çek bigirin, heta ya bêçek, ji ya muxalefeta nav pergala parlamenteriyê bigirin, heta ya derveyî wê û ji yên çalak bigirin heta yên... ***Munewer Azîzoglu Bazan/R.2***



## Piştgirî roj bi roj zêdetir dibe

Bi aramca piştgiriyê bidin çalakiyên greva birçîbûnê ya li zindanan a li dijî decrîdê, li Stenbol, Şirnex, û Dêrsimê çalakî hatin li darxistin. Di çalakiyan de hat xwestin ku tecrîd bê bidawîkirin... ***R.3***

## Derziya koronayê

Wekî tê zanîn nexweşiya Covîd-19'ê salek li dû xwe hişt û geşedanên baş û erênî jî çêdibin. Her çi qas hê rewşa xetere û xesas berdewam be jî li gel tevdîr û qedexeyan nexweşî hinekî sist bûye. Jixwe xala sereke jî ew e ku bi tevdîr û baldariyan berbelavbûna nexweşiyê kêm bibe. Ez zêde naxwazim li ser tiştên ku pir li ser hatine axaftin û tên zanîn bisekinim. Ji ber ku mijara derziya koronayê di rojevê de ye ez ê li ser vê naverokê hûr bibim. Di serî de em pênaseya parzayê (perpûn, derzî, aşî) bikin. Parza ew tişt e ku şîfre û genetîka vîrûs, bakterî an jî sedemên din ên nexweşiyan tên lawazkirin an jî pûçkirin û bi awayê dilop an jî derziyan didin mirovan... ***Dr. Eser Çetîn /R.7***

## Êzîdî li ber xwe didin

Der barê serdana wezîrê parastinê yê Tirkiyeyê Hûlûsî Akar de hevseroka desteya rêveber a Şingalê Rîham Hiço axivî û da zanîn ku tişta DAIŞ'ê nekirî niha Tirkiye dixwaze bike. Rîham Hiço têkildarî berxwedana gelê êzidî ya li hundir û derveyî welat diyar kir ku bi mehan e gelê Şingalê li dijî lihevkirina Bexda-Hewlerê li ber xwe dide û wiha got: "Ev peyman ji bo qirkirina civaka êzidî hatiye îmzekirin û dixwazin bi vê peymanê êzidiyan bêwelat bihêlin. Îro gelê me ji bo destkeftî û nirxên xwe di têkoşîn û berxwedanê de ne. Li her derê li dijî peymanê derdikevin, tevî vê jî... ***R.6***

## Xeyalên 'Tûrana Mezin'

Tirk li Kazakistanê bi rengekî çalak tevdigere; personelên fermandariya herî jor a artêşa Kazakistanê perwerde dikin û têkiliyên aborî bi pêş dixin. Kazakistan neft û berhemên neftê, metal, genim û madeyên din ên xav difroşe Tirkiyeyê. Tirkiye jî qumaş, kinc, pêlav, alavên pîşesaziyê, kelûpelên malê û alavên avahiyê ji Kazakistanê re peyda dike. Tirkiye di afirandina pargîdanî û pargîdaniyên hevpar ên bi beşdariya biyaniyan de li Kazakistanê piştî Rûsyayê di rêza duyemîn de ye.Enqere di warê aborî de, di pêşbaziya Moskov û Pekînê de... ***Kurdistan Lezgîyeva /R.8***

## Derd kurdî be derman ji malê ye

Tu carî bi qasî niha nîqaşên xetereya li ser kurdî nedihat kirin. Bi rastî nîqaşeke derengmayî ye jî çunkî li gorî rapora UNESCO'yê kurdiya zazakî di nav wan zimanan de ye ku bi mirinê re rûbirû ye. Her kes li gor xwe tespîtan dike, li sedeman digere, xebatan dike û li gor xwe çareyekê tîne zimên û fikrên xwe jî wek çareya tekane dihesibîne. Di nav van pêşniyazan de yek heye ku zêdetir li pêş e û hingî pê bawer in ku li ser zimanê milyonan ev gotin û bûye slogan: "Bila kurdî bibe zimanê fermî". Bêguman daxwazeke pîroz e û divê pêk were... ***Cemîl Guneş /R.5***

# Parastina fikrî û rêxistinî

Elîf Can Alkan

Li bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê mijara parastina cewherî ji her demê bêhtir xwe ji bo civak û jinan dide ferzkirin. Bi taybetî ev mijar piştî bûyera jina bi navê Melek Îpek dîsa ket rojevê. Beriya mehekê Melek Îpek mafê xwe yê parastina cewherî bi kar anî û mêrê îşkencekar ê bi navê Ramazan Îpek ku pê re zewicandibû kuşt. Piştî kuştina mêrê îşkencekar dewletê Melek Îpek girt û xist girtîgehê.

Wekî me got piştî vê bûyerê mijara parastina cewherî dîsa bi awayekî lezgîn ket rojeva jinan. Gelo parastina cewherî çi ye? Pêkanîna qeyd û bendên wê çi ne? Divê ev pirs bên bersivandin.

Dema parastina cewherî tê gotin yekser û tenê aliyê fîzîkî yê parastinê tê hişê mirovan. Lê parastina cewherî tenê parastina fîzîkî nin e, ji parastina fîzîkî wêdetir e. Erê parastina fîzîkî parastineke girîng e lê divê destpêkê jin li ser tişta ku dibe sedema tundiya fîzîkî bisekinin, çavkaniya wê û ji ber nebûna çi pêk tê, lêkolîn bikin.

**Parastina bingehîn û esasî**

Parastina cewherî ya herî girîng û bingehîn ji aliyê fikrî ve xwe pêşxistin û birêxistinkirin e. Jin divê destpêkê li hemberî pergala mêr parastina fikrî û yekgirtinê pêk bînin. Ji ber pergala heyî yekser êrîşî rêxistinbûna jinan dike, dixwaze rêxistinbûna jinan ji holê rake ku bi awayekî rihet jinan û nirxên ku jinê di nav civakê de daye avakirin bi temamî ji holê rake. Ji ber çi em dibêjim beriya her tiştî parastina fikrî û rêxistinbûyînê. Pergala mêr ji her alî ve jin parçe kiriye, heta hatiye wê astê ku jin parastina tundiya mêr dikin.

Mînak; jinekê li hemberî mêrê ku tundiya fîzîkî lê dikir xwe parast û mêrê êrîşkar kuşt. Lê ger rêxistinbûneke xurt a jinan tunebe dê ew jina ku ji aliyê fîzîkî ve parastina xwe ya cewherî pêk anî ji aliyê pergala mêr ve bê eciqandin û tunekirin. Ji ber vê yekê dibêjim serê her tiştî rêxistinbûyîn e.

Mînakên şênber jî hene,wekî jinên Rojava. Jinên Rojava di nav şer de hem xwe ji aliyê leşkerî ve parastin hem jî ji aliyê fikrî ve xwe perwerde kirin. Ji ber zanîn heta perwerdeya fikrî û rêxistinbûyîna jinan tunebe dê ji aliyê leşkerî ve nikaribin xwe biparêzin.

Lê mixabin ev tenê li herêmekê sînordar maye, divê ev li her derê cîhanê bê belavkirin.

Ji ber ku mêr tenê ji aliyê fîzîkî ve êrîş nakin, ji aliyê fikrî ve jî êrîşî jinan dikin. Jin tenê rastî êrîşa fîzîkî nayên, rastî êrîşa fikrî, derûnî û hwd. jî tên. Çareseriya van tiştan pêşxistina nêrîna jinan û birêxistinbûyan wan e.

Ji ber vê yekê dema parastina cewherî tê gotin divê tenê yek alî û aliyê fîzîkî neyê fikrandin. Parastina fikrî û rêxistinbûyîn parastina sereke ya cewherî ye. Divê jin parastina xwe her tim li ser vî esasî pêk bînin. Heta xala esasî li her derê cîhanê ji aliyê jinan ve pêk neye û nebe pergal dê tu carî parastina fîzîkî ya jinan li dijî pergala mêr nikaribe biparêz e.




Mizgîn Ronak

# Yekitî paşa

Arşîvên kurdan tije pêşnûma, bername û hedefên li ser yekitiya kurdan û dijberê wê ne. Gotina ku herî zêde hatiye û tê şixulandin jî “yekitî” ye ku tayên porê me jî şaneyên xwîna me jî bi vê gotinê kemilîne, dikemilin lê yekitî kanê? Çi dike ev gotina ku di devê me de zengarî, di derûniya me de kufikî bûye! Carna dibêm, gere mirov peyvan jî ramanan jî berovajî bike, mîsal; belkî yekitî “yekitî” nîn e û yekitiyê nayne.

Niha li vir, yekitî wekî xeyalek (peyrewek) dirinde mîkrofonê digre û dibêje; “Çawa wiha dibêjî?” û mînakan rêz dike; “Kongra Afrîkaya Başûr” (ANC) kongra nizanim li ku û serkeftinên wê ji min re ne xem e. Lew Şêx Ubeydulah Nehriyê ku yekem car konferensa neteweyî li dar xistiye, hem jî li çiyayên Kurdistanê û di nava agirê berxwedanê de! Yanî yekitî, civîna yekitiyê ANC, li welatê me çêbûye lê xêra wî ne ji wê re ne jî ji me re çêbûye.

Lew hem têkoşîna “Sosyalîzma reel) hem jî rewşên li ber çavan nîşan didin ku bi belavok, civîn, encamname û deklerasyonan; dîrok jî civak jî mirov jî naguherin û nabin yek! Mînak; Partiya Komunîst a Sovyetê berî hilweşandinê jî bi belavokan diyar dikir ku ew “Sosyalîzma bê qusûr û serkeftî” nizanin ji kengê ve gihîştiye merheleya komunîzmê. Belkî jî anarşîst ji roja roj de mafdar û zanyar bûn ku digotin; “bi qirtasiyevaniyê tiştek naçe serî, mane û armanc pêk nayê.” Her wiha şoreşger û romantîka ebedî Rosa Luksemburg jî dibêje; “Şoreş jî yekitî jî bi giştîname, talîmat û belavokan pêk nayê!” Jixwe di dema wan de jî eniya çep xwe ji bo “yekitiyê” diperitand û bi dehan bername û belavok li hev diqelibîn, bi sedan kongre çedibûn; belam yekitî li wir jî xeyaletek bû û li zirneya xwe dixist. Her wiha belkî Yekitiya Sovyetê jî bû qurbana yekitiya xwe! Bi kurtasî lazim e em rêbaz biguherînin. Ma dengê Îhsan Nûrî, Celadet, Cîgerxwîn û Mestûre Erdelanî jî nayê me? Ew jî tev ji destê yekitî paşa nebûn perwaneyên şewitî...

Yekitî paşa dîsa mîkrofonê digre û dibêje; “Ma Kurdistan çar perçe ye, çawa behsa yekitiyê neyê kirin?” Belê, çar, an pênc perçe ye û kurd jî nizanim çend sed perçe ne û ev yek li hesabê te tê! Tu wekî zîloyan bi xwîna vê rastiyê dimêjî û wiha me di nava heriya “yekitiyê” de dihêlî û bi vî awayî jî belawelatir dikî. Bi kurtasî, em hemû bêzar, aciz û westiyayiyê “yekitiyê” ne, ey yekitiya belavker! Yekitî nabe! Ji bo ku em jî neşibin te, naxwazin reçete û bendên belavokan bidim pey hev û ji xwe dê hingê jî nebe çare. Lew “ev qad” ji (belavok, reçete û hwd.) qada reqabet û pêşbaziyek çavsor e lê belkî jî yekitî ew e ku her kes bibe kirde, serdestî yan bindestî, kêmar an piranî hukmê xwe winda bike û bang û hewara saziyan, ên dubare li ber bayê neçin ku êdî ba jî; ji van bangewaziyên bêencam aciz bûye.

Seydayê Cîgerxwîn dibêje; “Em nebin yek/em ê herin yek bi yek” (Xwezî bi wan rojên ku bavê min ê ronakbîr, dîwanên Cîgerxwîn jiber û bi dengek dildar dixwend û kêliyên jiyanê bi robara helbestê bi oxir dikir!) Wateya vê yekê ne yekitî paşa ye. Jixwe em nebûne “yek” ne jî çûne “yek bi yek” lê em hatin ber devê birînek wisa ku ger em bi “yekitiyên nû” fir nedin xwe, em ê tê de bifetisin jixwe em nefetisin jî dê “yekitî” bi artêşên xwe yên xeyalet û qîçbeş, me tune bike. Beriya ku xatir bixwazim vê jî bibîr bînim: ANC, Efrîqaya Başûr wisa “kir yek” ku niha gola xwînê ye û bêdeng û hes, her kesê difetisîne. Yanî mînak; tenê ‘mînak’ in.

*Xatir xwestin destên xeyalperestiyê/li bin xalîçeyan zîldan/lêvên wê yên badok/ketin xewna me/bi kemanek nexweşok/lê dîsa jî xweş bû xeyalperestî/Bi pepikên tazî li ser agir dimeşiya.”*

***Min bi zanetî behsa yekitiyên serdestan nekir lê NATO û YE’yê jî “Yekitî” ne.**



Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

# Vîna bedenên birçî

Tevgerên siyasî û civakî yên ji bo azadî û wekheviyê têdikoşin, ji bo gihiştina armanca xwe, mobîlîzekirina civakê û mirovan û bi taybetî li dijî zilm û zordariyê gelek amûrên têkoşînê pêş dixînin. Her wiha amûrên li dijî newekhevî, bêedaletî, mêtingerî ango bi giştî li hemberî dijminatiyê tên pêşxistin cur bi cur in. Ji têkoşîna bi çek bigirin, heta ya bêçek, ji ya muxalefeta nav pergala parlamenteriyê bigirin, heta ya derveyî wê û ji yên çalak bigirin heta yên pasîf gelek amûrên berfireh digirin nava xwe. Greva birçîbûnê yek ji têşeyên çalakiyên polîtîk e û mirov di vê çalakiyê de bedena xwe wek kirde ji bo biserketina armanca xwe radizîne birçîbûnê.

Çalakiya greva birçîbûnê wek fenomeneke polîtîk û çandî destpêkê nîvê sedsala 18’an de ji hêla tevgerên li dijî koletî û îşkenceyê ve wek têşeyeke çalakiyê hat bikaranîn. Bêguman li dijî koletiyê bedana ku hatiye dîl girtin -û ne ya te bi xwe ye- birçî hiştin serî rakirineke bêhempa bû. Ji xeynî vê bi vî awayî bala civakê bi ser êşa xwe ve kişandin (zilm), êşê pêhêstkirin (empatî), nirxên mirov-bûnê ji carekê ve bibîrxistin (wijdan) pêwîst bûn. Ji wê demê ve ye ‘laşê birçî’ wek amûra rexneya polîtîk a li dijî serdestan tê dîtin û bi vî awayî ‘mirov’ di çalakiya xwe de hem bedenê hem derûnî wek kirdeya esasî derdikeve pêş.

Biryara birçîbûnê hêza exlaqî (moral) ya kesa/ê çalakger nîşan dide. Ji ber vê yekê ye ku heta çalakger bi xwe biryara dawîanîna çalakiyê neynin, tu hêz û tu kes nikare vê yekê bi zorê bi wan bidekirin. Ji bilî vîna xurt û biryardayîna bê şik, ruhê fedayîtiyê di bedena mirov de temsîliyeta xwe dibîne. Lewre îrade û kesayeta bi hêz, ji hêza hemû serdestan xurtir e.

Di sedsala 19’an de ev çalakî bi giranî ji hêla şoreşgerên dîlgirtî ve li girtîgehên her çar aliyê cîhanê li hemberî rewşên dermirovî û ji bo pejirandina nasnameya wan a siyasî wek ‘çek’ hat bikaranîn. Yekemîn çalakiyên greva birçîbûnê yên bi daxwazên polîtîk ên girtiyên siyasî di sala 1909’an de ji hêla jinên Sufrajet ve li Brîtanyayê û dûre di sala 1917’an de li Amerîkayê ji bo mafê hilbijartina jinan hatin lidarxistin. Heta destpêkê ev çalakî ji ber pêşengtiya jinan wek çalakiya jinan dihat dîtin. Lê di demeke kin de ev têşeya protestoyê ji hêla gelek tevgerên şoreşger, civakî û çepgir ve wek çalakiyeke polîtîk û kolektîf hat bikaranîn.

Di dîroka têkoşîna her çar parçeyên Kurdistanê de berxwedanên li girtîgehan xwedî cîhekî dîrokî ne. Ji xeynî zîlm û zordariya dewletan û îşkenceyên wan ên bêemsal berxwedêriya li dijî vê yekê bûye mijara bi sedan çîrok, stran, helbest, mesel û nivîsan. Girtîgeh di vê çarçoveyê de hem wek rûyê tazî yê dagirkeriyê û hem jî rûyê tazî yê têkoşîna xwe dane der. Herwiha di pêşketina Tevgera Azadiya Kurdistanê de pêşengtiya li girtîgehan û çalakiyên greva birçîbûnê/mirinê ji zû de di bîra civakî de cihê xwe girtine. Ji hêlekê de bi dîlgirtîbûna xwe û ji hêla din de bi înkarkirina hebûna xwe girtiyên siyasî di girtîgehên dewleta dagirker de temsîla tevgerên li dijî koletî û îşkenceyê yên sedsala 18’an dikirin. Laşê wan jî ji wan hatibû girtin. Û ew laş bi razandina birçîbûnê li dijî faşîzmê bû çeka herî mezin û bi bandor û her wiha bû yek ji sembola berxwedan û azadiyê.

Gotina Kemal Pîr ku tev li Hayrî Durmuş, Alî Çîçek û Akîf Yilmaz di 14’ê Tîrmeha 1982’an de dest bi Rojiya Mirinê kir, dibêje “bi qasî ku em di rêya wê de jiyana xwe feda bikin, ji jiyanê hez dikin” wateya grevên birçîbûnê/mirinê ji bo şoreşgeran diyar dike. Ew ji bo jiyaneke azad û bi heqîqet jiyana heyî ji mirinê re radizînin. Û bêguman ne ji bo jiyaneke takekesî. Ji bo têkoşînê û azadiyê jiyana xwe fedakirin yek ji karakterîstîka têkoşeran e. Lê vê yekê bi birçîhiştina bedena xwe kirin, her roj, kêlî bi kêlî jiyîn vîneke bêhempa dixwaze. Ev vîn û bawerî di têkoşêrên azadiya Kurdistanê de her daîm hebû. Ji salên 1980’î heta roja me ya îro girtiyên siyasî li girtîgehan, li yek ji qadên têkoşînê yên herî dijwar, di kêliyên dîrokî de wek wijdana civakê derdikevin pêş û bedena xwe ji têkoşînê re dikin sîper.

Greva birçîbûnê yên girtîgehê ji hêla çalakgeran ve wekî ‘rêya herî dawî’ tê dîtin. Di rewşa xwe ya sînorkirî de hem dixwazin ji siyaseta xitimandî re, ji ragihandin û protestoyên polîtîk ên din re rê vekin û hem jî bi vî awayî dixwazin wek yek ji aktorên têkoşînê helwesta xwe ya polîtîk nîşan bidin. Serkeftina greva birçîbûnê ji xeynî bicihanîna daxwazan di balkişandina ser mijar û çalakiyê de ye. Girtiyên siyasî bi çalakiya xwe peyamê tenê ji dewletê re naşînin. Her çiqas daxwaz ji rayederên dewletê re bên rêzekirin jî, li hêla din xîtabî wijdanê civakê dikin. Dixwazin êşa xwe bi civakê bidin hestkirin, dengê xwe bidin bihîstin. A ku dikeve ser milê me, nirxên mirov-bûnê, ji nû ve bi bîr dixînin.

# Piştgirî her roj zêdetir dibe

Çalakiyên greva birçîbûnê yên li dehan girtîgehan li hemberî tecrîdê û zextên li girtîgehan hatiye destpêkirin didome. Li derve jî hefteya borî li gelek navendan meş û çalakiyên piştgiriyê hatin lidarxistin. Vê hefteyê jî gelek daxuyanî hatin dayîn

Navenda Nûçeyan




Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK'ê, di 27'ê Mijdara 2020'î de, bi armanca bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 21 sal in didome û ji bo şermezarkirina binpêkirinên mafên mirovan ên di girtîgehan de zêdebûne, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Koma 12'emîn çalakî dewr girt û çalakî dikeve meha 3'emîn.

Li kampa Mexmûrê ya li başûrê Kurdistanê jî li dijî tecrîda li Îmraliyê, bi pêşengiya jinan di 18'ê kanûna 2020'î de, çalakiya greva birçîbûnê hat destpêkirin û didome. Welatiyên li kampa Lavrîo ya Yewnanistanê dimînin jî, ji bo bi dawîkirina tecrîda li ser Ocalan û piştgirîdayîna çalakiya greva birçîbûnê ya li girtîgehan dewam dike, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Çalakiya bi pêşengiya Tevgera Ciwanên Şoreşger (TCŞ), Tevgera Jinên Kurdistanê ya Ewropayê (TJK-E) û Navenda Çanda Kurdistanê hat destpêkirin û nêzî mehekê ye didome.

Li aliyê din, piştgiriyên ji bo çalakiyên greva birçîbûnê zêde dibin. Hefteya borî li gelek bajaran meş û çalakiyên piştiriyê hatin lidarxistin. DBP'a Amedê, der barê çalakiya greva birçîbûnê li ber Bîrdariya Mafê Mirovan a Parka Koşûyolûyê daxuyanî da çapemeniyê. Hevseroka DBP'ê ya Amedê Seval Gulmez ji bo ku çalakiya greva birçîbûnê bi rêya diyalogê bi dawî bibe û daxwazên girtiyan bên pêşwazîkirin, bang li rayedaran kir.

**Li Stenbolê meşa ciwanan**

Meclisa Ciwanên HDP'ê ya Stenbolê, bi armanca balê bikişîne ser çalakiya greva birçîbûnê ya ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan li girtîgehan didome, meşek li dar xist. Meş li semta Okmeydani ya girêdayî navçeya Şîşlî hat lidarxistin. Endamên Meclisa Ciwanan û rêveberên HDP'a Navçeya Şîşliyê tev li meşê bûn. Di meşê de bênavber dirûşma; "Bijî berxwedana zindanan" hat berzkirin.

**Li gelek navendan çalakî**

Li ber avahiya HDP'ê ya navçeya Kadikoy a Stenbolê, çalakiyeke girseyî hat lidarxistin û polîsan êrîşî çalakiyê kir. Di encama êrîşa polîsan de 8 kes hatin binçavkirin û kesên hatin binçavkirin piştî îfadeyê serbest hatin berdan.

HDP'a navçeya Hezex a Şirnexê jî bi heman armancê li ber avahiya xwe daxuyanî da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de pankarta "Bila daxwazên girtiyên siyasî yên di greva birçîbûnê de bên qebûlkirin, mirin ne çareserî ye" hat vekirin. Parlamenterê HDP'ê yên Şirnexê Nûran Îmîr, Hasan Ozguneş, rêveberên HDP'ê yên navçeyê û xizmên girtiyan tev li daxuyaniyê bûn.

HDP'ê li Dêrsimê ji bo piştgriyê bidin greva birçîbûnê û tecrîdê şermezar bikin daxuyanî da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de beşdaran pankarta "Bila daxwaz bên qebûlkirin, çalakiya grevê bê bidawîkirin" vekirin. Polîsan êrîşî çalakgeran kir û pankart desteser kirin. Li ser êrîşa polîsan HDP'î vegeriyan avahiya xwe. Polîsên ku têketin û derketina kolana Hunerê ji bo demekê girtin, piştre ji qadê vekişiyan.

Birayê Hevşaredara Qereyaziyê Melîke Goksû ku ketiye çalakiya greva birçîbûnê, Umît Goksû diyar kir ku tecrîd derveyî mirovahiyê ye û xwest ku daxwazên girtiyan demildest bi cih bên.

Serokwekîlê koma HDP'ê Sarûhan Olûç li meclisê civîneke çapemeniyê li dar xist û mijarên di rojevê de ne nirxand. Sarûhan Olûç diyar kir ku daxwazên girtiyên ku ji bo rakirina tecrîdê ketine greva birçîbûnê daxwazin demokratîk û mirovî ne û bicihanîna van daxwazan ne zehmet e.

## Tecrîd tunehesibandina kurdan e

Berdevka Meclisa Jinan a HDP'ê Ayşe Acara Başaran li Navenda Giştî ya Partiya xwe daxuyaniya çapemeniyê da. Başaran bal kişand ser çalakiyên greva birçîbûnê û wiha got: "Tecrîd li vî welatî bû navê şer. Tecrîd li vî welatî bû navê îşkenceyê û tunehesibandina kurdan. Girtî dibêjin; dawî li polîtîkayên êrîşkar ên li ser kurdan bînin, tecrîdê rakin. Daxwaza girtiyan daxwaza me ye jî, daxwaza gelê kurd in."

## Ev çalakî hişyarî ye

Cîgirê hevserokê giştî yê HDP'ê Tayîp Temel têkildarî grevên birçîbûnê û tecrîdê ji Ajansa Mezopotamyayê re axivî û wiha got: "Desthilat mirovan terkî mirinê dike. Em nikarin li dijî vê yekê bêdeng bibin û nikarin temaşe bikin. Me komîsyona şopandina grevê ava kir. Ev komîsyon ji plana çalakiyên lezngîn pêk tê. Em çalakiya girtiyan a dorveger û bêdem wekî hişyariyê digirin dest. Eger ev çalakî bibe çalakiya bêdem û bêdorveger, di şertên şewba vîrûsê de dê encamên pir xerab bi xwe re bîne. Ji ber vê yekê em dixwazin deng û daxwazên girtiyan bê bihîstin. Divê hikûmet û dewlet guh bide daxwazên girtiyan û gavan bavêje. Lê em dibînin hikûmet gavan navêje. Em nikarin li dijî vê helwestê bêdeng bimînin."

# Ji rêveberê yarsanan nameyeke vekirî

Rêberê baweriya yarsanên rojhilatê Kurdistanê, Seyîd Nesredîn Heyderî nameyek ji rêberê olî yê Îranê Elî Xamneyî re şand. Seyîd Nesredîn daxwaz ji Xamneyî kir ku Îran li hemberî baweriya yarsanan bi adilane nêz bibe û cudakiriyê nexe navbera baweriya yarsan û olên din de.

Rêberê baweriya yarsanan Seyîd Nesredîn Heyderî, der barê zilm û zextên rejima Îranê yên li beramberî baweriya yarsanan, nameyek vekirî ji rêberê olî yê Îranê Elî Xamneyî re şand.

Seyîd Nesredîn di nameya xwe de wiha dibêje: "Baweriya Yarsan her tim alîgirê aştî û sebrê ye. Her tim xwe ji aloziyan dûr girtine. Lê tevî vê yekê jî her tim bi awayekî nedadperwerane nêzî baweriya yarsan dibin û cudakariyê dixin nav yarsanan û olên din. Mafên bawermendên yarsanî tên binpêkirin."



Seyîd Nesredîn daxwaz ji Elî Xamneyî dike ku mafên bawermendên yarsan di qanûnên Îranê de parastî bimînin û cudakariyê nexin navbera yarsan û îslamê. Her wiha bang li Xamneyî dike ku li Îranê dawî li bêmafiyên li beramberî yarsanan tên kirin bîne. ***SILÊMANÎ***

# 'Hevdîtinên Kar û Nan' dest pê kir

HDP'ê bi civîneke çapemeniyê ku li rêxistina xwe ya Amedê li dar xist starta 'Hevdîtinên Kar û Nan' da.

Alîkarê hevserokê giştî yê HDP'ê Garo Paylan ku ji komîsyona aboriyê berpirsiyar e di civînê de axivî û da zanîn ku li dijî xizaniyê dest bi 'hevdîtinên kar û nan' kirine û ev tişt anî ziman: "Tevahiya salê em li her dera Tirkiyeyê li welatiyan guhdarî bikin. Destpêkê em hatin li karkerên Amedê guhdarî bikin. Em hatin li derdên jin û ciwanên Amedê guhdarî bikin. Li herêmê rêjeya bêkariyê di seriya ji sedî 50'yî de ye. Em dizanin ku li Amedê ji du kesan yek jê bêkar e. Bila hemû Tirkiye bizanibe ku em ne bêçare ne. Di beşa duyemîn a şewbê de dîsa dixwazin karkeran mehkûmî xizaniyê bikin. Em ê li her derê li welatiyên xwe guhdarî bikin û derdên wan bibin Enqereyê. Em ê bi guhên ku naxwazin bibihîzin bidin bihîstin. Em ê qêrîna gel bigihînin Enqereyê. Em ê derdê gel bigihînin ew bêwijdanên ku li Qesrê kêfê dikin." ***AMED***



# Kolber bi rojan e di bin berfê de ne

Kolberên bi navê Molaî Hudaî, Firat Hudaî, Bîlen Ehmedî, Yaver Eslanî û Metîn Eslanî yên ku di 18'ê çileyê de di bin aşûtê de man, hêj nehatine dîtin. Ji bo kolberên li mezraya Dirîşkê ya girêdayî Gundê Xaşkanê ya li ser sînorê Îranê ya navçeya Elbakê ya Wanê di bin aşûtê de mane, li heremê xebatên keşfê hatin kirin. Heta niha nehat zanîn ku wê xebatên lêgerîn û xelaskirina kolberan kengî dest pê bikin. ***WAN***

# Rêyên gelek gundan hatin girtin

Li Kurdistanê hefteya borî li gelek bajaran berf bariya û rêyên gelek gundan hatin girtin. Li Gêdûka Harûna ya li ser rêya Gever û Şemzînanê aşût hat xwarê. Li bajarên Agirî û Wanê yên herêma Serhedê, bi rojan e berf dibare û seqemeke zêde heye. Ji ber vê barîna zêde ya berfê û seqemê li her du bajaran jî di rêyan de pirsgirêk hene. Ev pirsgirêkên heyî ji aliyê saziyên berpirsiyar ve nayên çareserkirin û ev jî dibe sedem ku welatî di çûn û hatina di navbera bajar û navçeyan de zehmetî bikişînin. ***WAN***

# Li Licê operasyon û binçavkirin

Operasyona ku di 9'ê çileyê de li gundê Cinezur, Dêrxust, Hiseynik û Mişrefê yên navçeya Licê ya Amedê hatibû destpêkirin, didome. Di roja destpêkê ya operasyonê de di navbera HPG'î û leşkeran de şer derketibû û leşkerek jiyana xwe ji dest dabû û 3 leşker jî birîndar bûbûn. Piştî operasyonê 35 kes hatin binçavkirin û sedema binçavkirinê nehat hînbûn. Li aliyê din walîtiya Colemêrgê, 12 herêmên girêdayî navenda bajêr û navçeyên Çelê, Geverê û Şemzînanê yên Colemêrgê, bi hinceta "herêma ewlekariya taybet" heya dawiya salê qedexe kirin. ***AMED***

# Ceza li rojnamegeran hat birîn

Li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê zextên li hemberî rojnamegeran didomin. Ji ber ku tev li bîranîna rojnameger Mazlûm Erencî bûbû ku di sala 2011'an de li Dersimê jiyana xwe ji dest dabû, doz li rojnameger Zeynel Abîdin Bûlût hatibû vekirin. 10 meh cezayê girtîgehê li Bûlût hat birîn. Di doza nûçegihana rojnameya Yenî Yaşamê Hatîce Şahîn de ku ji xebatên KCD'ê tê darizandin, biryar hat dayîn ku li şahidên nepen bê guhdarkirin. ***AMED***

## FAKULTEYA JINEOLOJIYÊ MÎNAKA YEKEMÎN A CÎHANÊ YE

# Di nav şer û şoreşê de perwerde

■ Bêrîvan Kayi

*Dibe ku hin caran di fîlm an jî belgefîlman de em rewşa welatekî bibînin ku di nav şer de ciwanan perwerde dike. Dema em bala xwe didin Rojava, tişta ku heta niha di wan fîlman de jî nehatiye xeyalkirin, bi awayekî şênber tê jiyîn. Belkî jî wek fîlozofê amerîkî Noam Chomsky dibêje 'şoreşa rojeva mûcîzeyek e' û parçeyekî vê mûcîzeyê jî zanîngeha Rojava ye. Em bala xwe bidin cîgirê hevserokatiya zanîngehê Aram Hesen ka der barê kar û xebatên wan de çi dibêje.*

**Hûn dikarin hinekî qala pêvajoya zanîngeha Rojava bikin, di nav şert û mercên çawa de zanîngeh ava bû?**

Zanîngeha Rojava di sala 2016'an li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li bajarê Qamişlo, hat damezirandin. Armanca wê pêkanîna pêwîstiyên herêmê ji hêla cîbicîkirina pêwîstiyên zanistî û amadekirina pisporên di warên cur bi cur de ye.

Derfet ji bo xwendekarên Rojava û Bakur û Rojahilatê Sûriyeyê re ava kir da ku xwendina xwe temam bikin. Her wiha bû derfet ji bo xwendekarên ku ji ber şerê li Sûriyeyê xwendina xwe berdewam nekirin.

Bêguman zanîngeh di şert û mercin ne normal de hat damezrandin, yanî di rewşeke ku hebûn û tunebûna me di nîqaşê de bû her wisa ku jiyîn bixwe zehmet bû. Carnan di rojekê de bi dehan şehîdên ku ji bo parastina vê axê canê xwe didan, ji bo pakrewanagehan dihatin veguhastin. Di rewşeke wisa de li kêleka gelek saziyan, zanîngeha Rojava jî hat damezrandin. Lewma ji hêla derfet û îmkanan ve kêm û kurtî pir bûn, heta di peydakirina akademîsyen, pispor pir zehmetî dihatin kişandin. Her wisa ji ber şert û mercên şer, gef û ambargoya li ser Rojava di hêla madî de jî zehmetî hebûn, lê niha piştî derbasbûna 4 salan rewş bi ser hev de tê û ji gelek aliyan ve tekûz dibe.

**Wek tê zanîn, bi hişmendiyeke cuda hûn pergaleke alternatîf diafirînin. Çi ne taybetmendiyên zanîngeha Rojava?**

Rêgez û bingeha zanîngehê ji hêla wanedayîn û pergala nirxandinê ve ji yên din cuda ye. Nirxandin di vê pergalê de pêvajoyeke berdewam û her timî ye ku xwendekar û mamoste xwe tê de dibînin. Pergala nirxandinê ya zanîngeha Rojava pêvajoyên perwerdeyê ji hev qut nake. Mamoste ne tenê di dema ezmûnan de, lê di hemû pêvajoyên xwendinê de bi xwendekaran re têkildar in û wan dişopînin. Di dem û cihê xwe de bi xwendekaran re dibin alîkar û berê wê/î dide serkeftinê. Bi rê û rêbazên afrîner mijarên perwerdeyê bi xwendekaran dide naskirin. Ne tenê agahî, lê rêbazên xwegihandina agahî û rêyên çareseriyê jî nîşan dide û têdigihîne.

Zanîngeh li ser bingeha Neteweya Demokratîk, azadiya jinê, civaka ekolojîk û çêkirina têkiliyên hezkirin û biratiyê di navbera pêkhateyan de hatiye avakirin. Paradigmaya zanîngeha me civakek demokratîk esas digire. Zanîngeh bi rêya meclisa zanîngehê ya ji hevserokên zanîngehê û hevserokên fakulte û peymangehan pêk tê, her wiha hemû pêkaheteyên zanîngehê cihê xwe tê de digirin, bi rê ve diçe, her wiha berdevkên xwendekaran jî di meclisê de nûnertiya xwendekaran dikin.

**Materyalên zanîngehê çawa tên amadekirin û hûn ji kîjan çavkaniyan sûdê werdigirin?**

Weke tê zanîn li zanîngeha Rojava materyalên taybet tune ne. Lewma di destpêka damezrandina zanîngehê de, di hemû beşan de komîte hatin avakirin ji bo diyarkirina wane û materyalên ku pêwîst e di her beşekê de bên dayîn. Her wisa di hin beşan de jî ji bo her materyalekê komîte hatin avakirin ji bo diyarkirina naverok û mufredatên materyalê, di amadekirina muferdatan de xwe dispartin materyalên zanîngehên din û çavkaniyên cur bir cur, lê di hin beşan de jî mîna beşa ziman û wêjeya kurdî, naverok ji nû ve hat nivîsîn, lewma di vî warî de jî zehmetî dihatin kişandin. Hêjayî gotinê ye ku ev bû demek, girêdayî zanîngeha Rojava navenda amadekirina çavkaniyên zanîngehê hatiye vekirin û ev navend niha li ser amadekirina çavkaniyan dixebite, ji bo ku bi demê re ev pirsgirêk jî çareser bibe û çavkaniyên taybet li zanîngeha Rojava bên amadekirin.

**Kesên wek Davîd Graber serdana zanîngehê kirin û di demek nêz de feylesofê amerîkî Noam Chomsky jî bi rêya zoomê beşdarî paneleke zanîngeha we bû. Ev yek bandoreke çawa li xwendevanan dike û armanca we ji vê çi ye?**

Di nav van çar salên buhirî de, zanîngehê bala gelek akademîsyenên cîhanê kişand ser xwe. Ji ber ku paradîgma û sîstema alternatîf a dûrî sîstema kapîtalîst em dixwazin bi cih bînin ku azadiya jinan esas digere. Her wiha amadekirina kesên ku ji bo civaka xwe bibin xizmetkar û bi pêş bixin. Lewma kesên alîgirên vê paradîgmayê li cîhanê piştgiriya xwe nîşan didin. Yek ji wan ramanwerên navdar Davîd Graber bû ku serdana zanîngehê kir û di komxebata bi navê 'Perwerde û Zanîngeha Azad û Demokratîk' de bi nêrînên xwe beşdar bû. Her wiha beriya çend rojan jî ramanwerê bi nav û deng Noam Chomsky semînerek ji bo zanîngehê pêşkêş kir, bêguman piştgirî û tevlîbûna kesayetên wisa girîng e.




Bêguman têkilî bi gelek rewşenbîrên kurd ên li dîasporayê re jî hene û niha hin ji wan wê di warê xwendina bilind a niha zanêngehê amadekariyên wê dike, wê alîkar bin. Dîsa jî ne di asta ku tê xwestin de ye. Em bang li hemû pispor û akademîsyenên kurd dikin ku bibin alîkar

**Têkiliyên we bi zanîngehên din ên cîhanê re hene gelo? Heger hebin, di çi astê de ne û li ser kîjan mijaran?**

Têkilî bi gelek zanîngeh, akademî, akademîsyen û saziyên perwerdehiyê yên cur bi cur re tên danîn. Mînak, rêkeftinek di navbera zanîngeha Rojava û zanîngeha Parma ya Îtalyayê de hat îmzekirin.

Têkilî di navbera zanîngehê û Enstîtuya Kelepora Kurdî ya Silêmaniyê re hene.

Zanîngeh beşdarî konferansa cîhanî ya Toreya Roja Erda Cîhanê ya bi sernavê 'Rola Ciwanan' di pêşxistina çanda ekolojiyê de bû.

Di encama kampanyaya zanîngehê de ku 19'ê Tîrmehê dabû destpêkirin, ji bo piştgiriya bi zanîngehê re nêzî 150 akademîsyenên ji welatên cuda amade bûn û di warê zanist û perwerdeyê piştgiriya xwe nîşan dan.

Bi Enstîtûya Kalîfornaya re rêkeftinek hat îmzekirin. Rêxistina Gav ya li Fransayê, wê projeyekê amade bike ji bon alîkariya bi zanîngehê re.

Plansaziyeke hevbeş a semîneran bi zanîngeha Emden Leerê re, beşa tenduristî û karên civakî û beşa Jineolojî hatin nîqaş kirin û erêkirin. Plansaziyê 8 cotmehê dest pê kir.

Her wiha di demeke nêz de wê rêkeftinek bi zanîngeha Washingtonê re jî bê îmzekirin, her wiha hevdîtinên cur bi cur li gel akademîsyen û saziyan tên kirin. Armanca van hevdîtin û rêkeftinan karbeşî û alîkariya wan zanîngehan e. Di hemû warên pêwîst de; zanist, perwerde, peydakirina çavakaniyan û hwd.

**Hişmendiya zayenda civakî li zanîngehên pergalê û li nav civakê serdest e. Zanîngeha Rojava li mijara zayenda civakî çawa dinêre û di perewerdeya we de cih digire yan na?**

Zanîngeh li ser pergala hevserokatiyê (jin û mêr) hatiye avakirin. Di fakulteyan de hevserokatî heye. Nûnertiya jinê di rêveberiyê de û bi giştî li zanîngehê gihîştiye rêjeyeke bilind, ango heman pergal e ku di Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Bakur û rojhilatê Sûryayê de heye.

Biryar di zanîngehê de, di derheqê kar û xwendekaran de ji hêla encumenê ve tê girtin.

Fakulteya Jineolojiyê li zanîngeha Rojava mînaka yekemîn e li cîhanê. Fakulte sala 2017'an hat sazkirin. Jineolojî zanista jin û jiyanê ye. Armanca wê ew ku wateya rasteqîn û ji nû ve danasîna jinê û jiyanê bike. Jineolojî zanista jiyana hevbeş a azad e.

Destpêkirina şoreşeke ramanî ye li hemberî heşmendiya zayendperest a li civakê serdest e û belav bûye. Her wiha ji bo şoreşa jinê di vê sedsalê de bibe bingeh, jineolojî zanisteke nû.

Ji aliyekî din ve, hewl dide têkiliya di navbera mêr û jinan de, li ser bingeha wekehevî û azadiyê ava bike. Yek ji cudahiyên zanîngehê ew e ku li zanîngeha Rojava, di beşên din de jî dersên jineolojî û ziman û wêjeya kurdî hene.

**Li dîasporayê di gelek waran de reweşenbîr û zanayên kurd hene. Ji bo sûdê ji wan werbigirin tu hewldan û xebatên we hene gelo?**

Di nav têkilyên ku tên danîn de, bêguman têkilî bi gelek rewşenbîrên kurd ên li dîasporayê re jî hene û niha hin ji wan wê di warê xwendina bilind a niha zanêngehê amadekariyên wê dike, wê alîkar bin. Dîsa jî ne di asta ku tê xwestin de ye. Lewma bi rêya rojnameya we bang li hemû pispor û akademîsyenên kurd ên li dîasporayê dikin ku di milê zanistî û akademîk de bi zanîngehê re alîkar bibin alîkar.

Her wiha Mecilsa Jinan a Xweser di zanîngehê de heye û di meclisa giştî de jî berdevka xweser nûnertiya jinên zanîngehê dike. Wekî din jî di hemû polên zanîngehê de berdevkeke jin jî heye.

**Li aliyekî şer heye û li aliyê din jî hûn xebatên zanistî dikin û pergala perwerdeyê bi rê ve dibin. Zor, zehmetî û kêmasiyên perwerdeyeke bi vî rengî çi ne?**

Zehmetiya me ew e ku Rojava ne di rewşeke aram de ye. Gelek caran bi sedema şer û rewşa ewlehiyê de perwerdeya zanîngehê tê rawestandin. Lê belê hema ji destpêka şoreşa Rojava ve, ev her du xet bi hev re dimeşin; li kêleka serkeftinên leşkerî, di warê perwerdeyê de jî gelek destkeftî hatin bidestxistin.



## Aram Hesen kî ye?

Cîgirê hevserokatiya zanîngeha Rojava ye. Ji Qamişlo ye. Li zanîngeha Helebê beşa ziman û wêjeya erebî û peymangeha zanistên perwerdeyê xwendiye. Ji destpêka zanîngeha Rojava ve di rêveberiya fakulteya wêjeyê de ye. Berê carnan li beşa wêjeyê dersa pexşan û wegerê daye lê piştî peywira cîgiriyê û ji ber karên rêveberiyê ew niha dersê nade. Ev salek û nîv e, wekî cîgirê hevserokatiya zanîngehê li ser peywirê ye.

# Derd kurdî be, derman ji malê ye

Cemîl Guneş

**Li gorî UNESCO'yê ji 1950'yî heta niha li ser rûyê cîhanê 200 ziman mirine û ji bo metirsiya li ser zimanê me, em dibêjin bi zarokên xwe re bi kurdî bipeyivin lê gelo ji bo zimanek nemire axaftina bi kurdî ya zarokan re bes e?**

Tu carî bi qasî niha nîqaşên xetereya li ser kurdî nedihat kirin. Bi rastî nîqaşeke derengmayî ye jî çunkî li gorî rapora UNESCO'yê kurdiya zazakî di nav wan zimanan de ye ku bi mirinê re rûbirû ye. Her kes li gor xwe tespîtan dike, li sedeman digere, xebatan dike û li gor xwe çareyekê tîne zimên û fikrên xwe jî wek çareya tekane dihesibîne. Di nav van pêşniyazan de yek heye ku zêdetir li pêş e û hingî pê bawer in ku li ser zimanê milyonan ev gotin û bûye slogan: "Bila kurdî bibe zimanê fermî".

Bêguman daxwazeke pîroz e û divê pêk were, lê carinan piştî van pêşniyaz û sloganan xetereyek jî derdikeve pêşiya me. Ev bawerî û slogan carinan nahêle ku mirov li ber xwe jî bide. Ango mirov ji dêvla çalak be, bi gotinekê dilê xwe rehet dikin û wekî din tev nalivin. Niha di nav kurdan de gelek kes bawer dikin ku kurdî nebe zimanê fermî û li dibistanan neyê xwendin dê bibe zimanekî mirî. Ez ne li hember vê fikrê me ku bibêjim xetereyeke wisa tune ye. Çunkî li gorî UNESCO'yê ji 1950'yî heta niha li ser rûyê cîhanê 200 ziman mirine. Ew tirsa min jî heye ku kurdî bimire lê çare û pêşniyaza min a sereke, ne fermîkirin û xwendina kurdî ye. Heke em bibêjin fermîbûna zimanekî, wî zimanî ji mirinê xelas dike û çare ye, nexwe beriya nivîsê ev ziman çawa bi hezaran salan li ber xwe da? Yan jî berovajî vê pirsê, zimanên ku bi sedan salan fermî bûn û li dibistanan dihatin xwendin, çima mirin? Piştî van gotinan gelo ne heq e ku em vêya jî bipirsin; em li hêviya fermiyeta kurdî bin, dê kurdî nemire? Li gor min heke ev feraset û bawerî belav bibe, dibe ku kurdî heta 10 salan bibe zimanê kal û pîran.


Dîsa em ê li deriyê dilê zarokan bidin û bibin mêvan ku ji me re bibin derman. Ango derman kurdî be, derman zarok in. Hema hema li mala her kesî zarokek heye. Ka bînin bîra xwe. Belkî cara ewilî em bi dengderxistina wan zarokan bi hebûna wan a li malê dihesin û dengderxistina wan coşeke mezin dide me. Qet ferq nake ku ew pitik çi deng derxistibin yan jî çi peyv, kêfeke mezin dide me. Em jî piştî wan dengan zêdetir bi wan re dipeyivin ku zarok hînî axaftinê bibin. Armanca me jî ew e ku ew zarok mezin bû şûn de, karibin hest, fikir û derd û a dilê xwe ji me re bibêjin. Ango em dixwazin peywendiyê bi wan re deynin. Li vir veguhestinek heye, veguhestinek ji mezinan ji bo zarokan. Ziman bîr e, heke ew bîr neyê veguhestin dê biçe ji bîr û bimire jî! Gelo em tu kes li malê bi zarokan re nepeyivin, dê ew zarok hînî zimên bibin? Belkî tenê dengên xwezayî zanibin! Jixwe li gorî lêkolînên ku hatine kirin diyar bûye zarokên li mala xwe mezin bûne, ji yên êtîmxaneyan mezin bûne zêdetir peyvan dizanin. Nexwe ji bo peywendiyeke xurt ma ne hewce ye em zarokên xwe bi zimanê xwe mezin bikin û ew jî zarokên xwe... Lê ka em çend kes zarokên xwe bi zimanê xwe mezin dikin? Bav û kalên me ku vî zimanî hezaran salan bê nivîs, bê fermîtî û bê xwendin parastine û ji me re kirine xezîne danîne ber me lê em xatirê vê tecrûbeyê nizanin û çavê xwe li dermanê xwe re digirin. Çunkî êdî ji aliyê gelek zimannasan ve tê piştrastkirin ku zimanek nebe zimanê zarokan, dê ew ziman bimire.

Baş e ku ji aliyê hişmendiyê ve pêşveçûneke wisa jî heye di nav me kurdan de. Ango êdî em jî baş dizanin ku parazvanê herî mezin yê zimanekî zarok in. Em kengî vê xetereyê dibînin wek pêşniyaz em vêya dibêjin. Çunkî li gorî lêkolîneke Rawestê ya ku di sala 2019'an de bi navê "Rewşa kurdî di navbera zarok û dê û bavan de" hatiye kirin ji sedî 88'ê kurdan dixwazin ku zarokên wan hînî kurdî (kurmancî/zazakî) bibin. Rêjeyeke gelekî baş e, lê mixabin wek xetereya li ser zimên, me vêya jî kiriye slogan û em dibêjin; bi zarokên xwe re bi kurdî bipeyivin. Bêguman ev jî rast e, teqez divê her kurd bi zarokên xwe re bi kurdî bipeyive, lê piştî vê rastiyê, xetereyeke din jî derketiye pêşiya me. Ango em dibînin daxwaza me ji rastiya me dûr e. Gelo ji bo zimanek nemire daxwaza axaftina kurdî bi zarokan re bes e? Mixabin ne bes e çunkî di navbera daxwaz û hewldanê de ferqeke pir mezin heye. Çunkî li gor heman lêkolînê ya Rawestê, tenê ji sedî 14'yê kurdan hewl didin ku zarokên wan hînî kurdî bibin. Bêguman çare axaftina bi zarokan e lê ev jî divê bi awayekî xurt bê kirin.

Ka em dev ji vê nîqaşa daxwaz û rastiya kurdan berdin û li xwe vegerin çunkî li me dereng e. Êdî gelek kes pê dizanin ku mixabin dibe ku axaftina bi kurdî ya bi zarokan re jî vî zimanî xelas neke. Nexwe piştî van gotinan belkî çare ne tenê axaftin be, divê em bi zarokan re kurdî bijîn. Çunkî li ser rûyê dinyayê guherîneke mezin heye û zarok jî li ber wî bayê guherînê ne. Nexwe divê zarokên xwe bi tiştên herî xweş û hêja mezin bikin ku li hember vî bayê xedar têk neçin. Bêguman rêyeke nû divê ji me re. Ne ferz e ku em di rêya serdestê xwe re herin ku xwe bigihînin wan. Divê em rêyeke serkeftî û kurdewar bibînin. Çunkî zarok ew zîndî ye ku tiştên xweş bala wan dikişînin. Tiştên biçûk ku bala me nakişînin, carinan dibin xeyalên wan. Xetereyeke din jî ew e ku zarokên kurdan duziman in lê mixabin duzimaniyeke wan ya kêmanî heye. Ango zimanê wan yê zikmakî têk diçe û zimanê serdest dikeve şûna zimanê wan ê zikmakî. Sal êdî 2021 û teknolojî roj bi roj bi pêş ve diçe. Çandeke populer heye ku me tevan daye ber xwe û me li dû xwe kaş dike. Dengên baş derdikevin, anîmasyonên baş tên çêkirin, wêneyên rengîn tên xêzkirin û karekterên ku bala zarokan dikşînin tên avakirin. Mixabin ev jî bi piranî bi zimanê serdestan tên çêkirin. Gelo ligel ew qas pêşketin, em ê bikaribin zimanekî tenê bi axaftinê li ser piyan bihêlin?

Nexwe êdî ne wextê gotinan e. Divê êdî em daxwaza xwe bi hewldaneke xurt bihûnin û divê jiyana me bi kurdî be. Divê em zarokên xwe bi muzîka xwe, bi hunera xwe, bi xweşiyên civaka xwe, bi xwezaya xwe û bi tiştên hêja û biqelîte mezin bikin ku em vî zimanî nedin ber bayê mirinê.



Amed Tîgrîs

# Fêdeya xwendina bi deng

Xwendina bi deng alîkariya pêşketina zarokan dike û têkiliyên dê û bav û zarokan xurtir û geştir dike. Ji derî pêşketin û têkiliyan çend sedemên erênî, kelk û sûdgirtinê hene ku mirov ji zarokên xwe re pirtûkê bi deng bixwîne. Ez dikarim van sedemên bi kelk û sûd wiha bi rêz bike:

Hînbûna xwendinê hêsantir û leztir dike. Dema mirov ji zarokan re bi deng dixwîne, zarok li peyvan guhdarî dikin û gencîniya (xezîne) peyvên wan pirtir û dewlementir dibe. Hatiye ceribandin ku zarokên li malê dê û bavên wan ji wan re pirtûk xwendine, dema çûne zarokxaneyê ew ji zarokên din bêtir peyv dizanibûne, fêm kirine û bi kar anîne. Ferqên mezin di navbera zarokên ku ji wan re pirtûk hatine xwendin û yên ku nehatine xwendin de hene. Zarokên ku li malê ji wan re pirtûk hatine xwendin, zû hînê xwendin û nivîsandinê dibin.

Dê û bav û zarok bi xwendina bi deng demeke hevbeş û hevgeş derbas dikin. Zarok bala xwe didin ew kesên ku ji wan re dixwînin. Ew kêlî xwendevan û zarok di nav xwe de nêzîkatiyeke germ hîs dikin. Dilovaniya zarok û dê û bav geş û xweş dibe. Bi hevdu re demeke şad û bextewar derbas dikin.

Zarok fêrî xwendina pirtûkê dibin. Ji bo zarokan xwendina pirtûkê karekî ne hêsan e. Zarok dema dêna xwe didin dê an bav çawa pirtûk dixwîne, ew dixwazin dê û bavên xwe kopî bikin. Demek bi şûn ve, mirov binêre zarokên biçûk ku hîn nikare bixwîne jî rûpelan ji aliyê rastê ber bi çepê ve diqelibînin û dixwazin lê binêrin. Zarok dema gotinek an hevokek fam nekin ji dê û bavên xwe dipirsin, "ev çi ye, ev çi dike" an "çi dibêje?"

Xwedina pirtûkê hestên rojane xurt dike, rewşeke aram û xweşhal diafrîne. Mirov ji pirtûkan gelek tiştên sûdmend werdigire. Bi xwendina pirtûkan rewşa heyî fêr dibe.

Xwendina pirtûkan mirov hînî konsantrebûn û baldariyê dike. Dema zarok rûdinin û guhdarî dikin, xwe li xwendinê konsatre dikin. Ew hînê guhdarî û xweragirtinê dibin.

Bi alîkariya xwendina bi deng zarokên biçûk dikarin demek zû dest bi axaftinê bikin. Ew hîn nikarin biaxivin lê hêdî hêdî dike pilepil û dest bi axaftinê dikin. Kîte û peyvan bi lêv dikin. Kilîda devê wan vedibe.

Bi xwendina bi deng û bi fêrbûna peyvan re, formulekirina peyv û hevokan hîn dibin. Hîn dibin ku peyvan çawa li du hev rêz bikin. Hînê xweîfadekirinê dibin.

Tema û mijarên pirtûkên zarokan rengîn û zengîn in. Di wan de hin peyvên giran hene ku zarok hîn nikarin fêm bikin, dê yan bav wan peyvên wiha bi zimanê ku zarok fêm bikin, dibêjin an şîrove dikin.

Pirtûkê bi xweşikî û hêsayî bixwînin. Dema mirov bi dil û can bixwîne, zarok jî bi kêf û dil û can guhdariya mirov dikin. Xwendina bi deng, bi jest û mîmikan weke şanogerek rengîntir û balkêştir bikin. Carnan mijarê bi jîyana zarok, malbat û derdora xwe ve girê bidin; wê demê zarok baştir fêm dike û şad dibe. Xwendina pirtûkan cîhana hişmendî û fantaziya zarokan bi pêş dixe, dewlementir û geş dike. Rêya jiyaneke serkeftî li pêşiya zarokan vedike.

**Li Swêdê di sala 2019'an de ji 2 hezar 710 dê û bavan pirsîne ka ji zarokên xwe yên di navbera salên 0-9'an de, salê çend caran bi dengê bilind pirtûk xwendine. Encama lêkolînê wiha ye:**

| | |
|---|---|
| Her roj | %30 |
| Di heftê de çend car | %31 |
| Di heftê de carek | %10 |
| Di mehê de 2-3 car | %8 |
| Di mehê de carek | %5 |
| Di 2 -3 mehan de carek | %3 |
| Di nîv salî de carek | %1 |
| Di salê de carek | %0 |
| Di salê de çend car | %4 |
| Hîç | %6 |
| Nizanim | %1 |

Dîsa ji wan kesan pirsîne ka çend xulek (deqîqe) pirtûk ji zarokên xwe re xwendine:

| | |
|---|---|
| 5 xulek an kêmtir | %9 |
| 6 -10 xulek | %27 |
| 11- 15 xulek | %35 |
| 16-30 xulek | %20 |
| 31-45 xulek | %4 |
| 46-60 xulek | %2 |
| 46-60 xulek | %1 |
| Nizanim | %1 |

# Polîtîkayên darvekirinê

Navenda Nûçeyan

Endamê Konseya Rêveber a KNK'ê Seîd Saêdî der barê siyaseta darvekirinê ya rejîma Îranê de axivî. Saêdî da zanîn ku armanca darvekirinan çavtirsandina kurd û şoreşgeran e

Rejima Îranê bi salan e li hember kurdên rojhilatê Kurdistanê bi polîtîkayên tund tevdigere û di bin navê sûcên siyasî, bi awayên cuda bêyî dadgehkirina vekirî û qanûnî kurdan bi dar ve dike. Em dikarin bêjin dîroka rejîma Îranê li ser tundî, zext, kuştin û bidarvekirinan hatiye avakirin. Îran li cîhanê ji aliyê darvekirinan ve di rêza yekemîn de ye. Heta niha li hember vê zilma rejîmê dengekî xurt li qada navneteweyî dernekeтiye. Ji ber vê yekê dewleta Îranê her sal bi dehan kurd, şoreşger û çalakvanan bi dar ve dike.



Her wiha rejîma Îranê di rojên borî de li bajarên Rojhilat û Tehranê li hemberî çalakvan û welatiyên kurd dest bi binçavkirinan kiriye û bi dehan çalakavan, xwendekar û welatiyên kurd hatibûn girtin. Der barê mijarê de Endamê Konseya Rêveber a Kongreya Netewî ya Kurdistanê (KNK) Seîd Saêdî axivî û diyar kir ku armanca bidarvekirinên Îran dike çavtirsandin e.

**Siyaseta qirkirinê kûrtir dike**

Seîd Saêdî di axaftina xwe de da zanîn ku pêvajoya girtin û qirkirina siyasî ya li Îranê ji heyama komara îslamî heta roja îro berdewam dike û wiha got: "Di salên borî de siyaseta girtin û zextên li ser kurdan zêdetir bû. Piştî ku nerazîbûna gelê kurd li hemberî siyaseta desthilata Îranê zêde bû, rejîmê jî siyaseta qirkirina siyasî li ser kurdan kûrtir kir."

**Zextên çavtirsandinê dike**


Endamê KNK'ê Seîd Saêdî der barê armanca qirkirinên siyasî de ev tişt anî ziman: "A yekem desthilata Îranê dixwaze bi zextên li ser gelê Kurd, gelên din ên Îranê û çalakvanên Îranê çavtirsandî bike da ku li dijî kiryarên rejîmê nerazîbûn nîşan nedin. A duyemîn jî dixwaze bi gelên din ên Îranê bide bawerkirin ku gelê kurd dixwaze Îranê parçe bikin."

**Wek xizmetkar dibînin**

Saêdî di berdewama axaftinê de destnîşan kir ku desthilata Îranê kurdan wek xizmetkarê xwe dibînin û wiha domand: "Îran li rojhilatê Kurdistanê rola kurdan bi tenê wekî xwedîkirina sewalan dibîne û wan wekî xwediyên sewalan bi nav dike. Vê siyaseta desthilatdariyê xwe di çapemeniya Îranê de jî daye der. Di çapemeniya Îranê de cil û bergên kurdî bi 'cil û bergên şivanan' tên binavkirin. Di hinek pirtûkên xwe de jî vê yekê tînin ziman."

**'Çalakvan bila yekitiyê xurtir bikin'**

Endamê Konseya Rêveber a KNK'ê Seîd Saêdî da zanîn ku li rojhilatê Kurdistanê tirsek zêde ya rejîma Îranê ji îradeya gelê kurd heye û axaftina xwe bi van hevokan bi dawî kir: "Ji bo wê divê çalakvanên rojhilatê Kurdistanê xebat û têkoşîna xwe hîn xurtir bikin. Partî û aliyên siyasî yên rojhilatê Kurdistanê jî yekitiya xwe xurtir bikin û bibin piştevanê xebat û têkoşîna rojhilatê Kurdistanê."



# 'Tirkiye dixwaze planên xwe yên qirêj bi Iraqê bide kirin'

Navenda Nûçeyan

Di 18'ê çileyê de wezîrê parastinê yê Tirkiyeyê Hûlûsî Akar bi şandeyekê serdana Bexda-Hewlêrê kiribû. Akar li Bexdayê bi Serokwezîr Mustafa Kazimî û serokomarê Iraqê Dr. Berhem Salih re civiya; li Hewlerê jî ji aliyê wezîrê pêşmergeyan Şoreş Îsmaîl ve hatibû pêşwazîkirin. Wezîrê parastinê yê Tirkiyeyê li başûrê Kurdistinê pêşî li gel serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) Mesûd Barzanî û piştre jî bi serokwezîrê Herêma Federal a Kurdistanê Mesrûr Barzanî re civiyabû.

Der barê serdana Wezîrê Parastinê yê Tirkiyeyê Hûlûsî Akar de Hevseroka Desteya Rêveber a Şingalê Rîham Hiço axivî û da zanîn ku tişta DAIŞ'ê nekirî niha Tirkiye dixwaze bike.

**Êzidî li ber xwe didin**

Rîham Hiço têkildarî berxwedana gelê êzidî ya li hundir û derveyî welat diyar kir ku bi mehan e gelê Şingalê li dijî lihevkirina Bexda-Hewlerê li ber xwe dide û wiha got: "Ev peyman ji bo qirkirina civaka êzidî hatiye îmzekirin û dixwazin bi vê peymanê êzidiyan bêwelat bihêlin. Îro gelê me ji bo destkeftî û nirxên xwe di têkoşîn û berxwedanê de ne. Li her derê li dijî peymanê derdikevin, tevî vê jî hikûmeta Iraqê dixwaze vê peymanê bi cih bîne."

Hiço di berdewam axaftina xwe de bal kişand ser Peymana 9'ê Cotmehê û ev tişt anî ziman: "Peymana 9'ê Cotmehê ji bo qirkirina civaka êzidî hatiye îmze kirin û dewleta tirk dixwaze vê plana xwe ya qirêj bi Iraqê bide kirin. Em ê weke civaka êzidî heya dawî li ber xwe bidin."



**Hevdîtina Tirkiye û PDK'ê**

Di axaftina xwe de Hiço bal kişand ser serdana Hûlûsî Akar û da zanîn ku ji ber lewaziya Iraqê welatên derve karin gelek tiştan bi Iraqê bidin qebûlkirin û wiha pêde çû: "Em dizanin ev plan ne yên Iraqê ne, bi zextên Tirkiyeyê pêktên. Li gorî me hevdîtinên di navbera PDK û Tirkiyeyê de, ji bo pêkanîna komkujiyek din a ser civaka êzidî ye. Dewleta tirk bi sedan gundên êzidiyan ên li bakurê Kurdistanê bi darê zorê da valakirin. Êzidiyên li wir ji çand û baweriya wan dûrxistin, hebûna êzidiyan li wir tune kirin. Dixwazin li Şingalê jî heman tiştî bikin û gel di komkujiyê re derbas bikin. Tirkiye dixwaze vê plana xwe bi Iraqê bide kirin. Eger êrîşek li ser me pêk were, çawa me di dîrokê de gelek caran li ber xwe da, em ê carek din li ber xwe bidin. Em rê nadin nirxên me yên pîroz ji dest biçin."

**'Dê serkeftin a gel be'**

Hevseroka Desteya Rêveber a Şengalê Rîham Hiço axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Dijminatiya dewleta tirk a li hemberî civaka êzidiyan ji dema Osmaniyan heya niha dewam dike. Êzidiyan tu metirsiyek li ser Trikiyeyê çênekiriye, lê Tirkiye tevî vê jî dixwaze ewlekariya Şingalê têk bibe. Em ê weke gelê Şingalê heya dawî li ber xwe bidin û dê serkeftin a gelê me be."



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Plana dagirkeriyê di dewrê de ye

Hefteya borî ji Tirkiyeyê şandeyekê serdana Iraqê kir. Şandeya ku serkêşiya wê wezîrê parastinê yê tirk Hûlûsî Akar û serfermandarê tirk Yaşar Guler dikir, du jê tumgeneral û fermandarê artêşa bejahî jî di nav de cih digirt, piştî serdana xwe ya Bexdayê derbasî Hewlerê bûn. Hevdîtin û mijara vê şandeyê yek ji rojeva sereke ya hefteyê bû.

Naveroka hevdîtinên şandaya tirk pêk anîn hêdî hêdî aşkera dibe. Her çiqas ji aliyên kesên ku herêmê ji nêz ve dişopînin ve naverok û armanca şandeya Hûlûsî Akar bê fêmkirin jî ji bo zelalkirina hin meseleyan pêwîstî heye ku mirov mijarê binirxîne.

Şandeya ku sernada Iraqê kir mirov nikare ji dagirkeriya dewleta tirk a li başûrê Kurdistanê cuda bibîne. Ev hevdîtin ji bo dewama dagirkeriya li herêmê û bi wê ve girêdayî dagirkirina herêmên cuda bû. Jixwe şandeya tirk ji rayedarên Iraqê xwestiye ku li dijî Tevgera Azadiya Kurdistanê şer bikin. Bi aşkerabûna vê plan û projeyê, dewlata tirk û hevkarê wê PDK li ser herêmê dixwaze bide meşandin jî zelal dibe.

Endamê Lijneya Asayîş û Parastinê ya Parlemantoya Iraqê Herêm Kemal Axa têkildarî hevdîtina şandeya tirk bi serokwezîrê Iraqê re pêk anî, hin agahî bi çapemeniya ereb re parve kirin. Herêm Kemal Axa diyar dike ku di dawiya sala 2020'î de dewleta tirk rêvebiriya Bexdayê agahdar kir ku eger nikaribe PKK'ê ji axa Iraqê derbixe, wê bixwe wî karî bikin û wê erîşên berfireh pêk bînin.

Di heman nirxandinê de Herêm Kemal Axa dibêje "Şandeya dawî ya Tirkiyeyê ya hatî Iraqê ji bo piştrastkirina wê hişyariyê, pêşkêşkirina bijardeyek din bû. Her wiha ji bo PKK'ê ji axa Iraqê derxîne heta dawiya meha sibatê, yan jî destpêka meha adarê dem dane Iraqê."

Li gorî qanûnên navneteweyî, mafê tu dewletê nîn e ku bêyî destûra wê, dewleteke din têkeve axa wê ango di nav sînorê wê de operasyonan pêk bîne. Lê dewleta tirk bi hinceta şerê li dijî PKK'ê ji salên 90'î ve li gor dilê xwe hem ji hewayî hem jî ji bejahiyê ve her gav derbasî nav axa Iraqê û herêma başûrê Kurdistanê dibe. Bêguman ji bo jî vê bêmafiya xwe re qilifekî çêbike, hevkarên mîna PDK'ê daye tenişta xwe. Niha ji bo dagirkeriya xwe ya li ser vê axê berfirehtir bike hikûmeta Bexdayê jî tehdît dikin.

Bêguman tehdîdên dewleta tirk ên li ser Iraqê bi awayên cuda dihatin ziman lê bi hatina şandeya wezîrê parastinê re ev êdî aşkera bûn. Ji bo çareserkirina van pirsgirêkên heyî di kanûna 2020'î de serokwezîrê Iraqê Mustafa Kazimî tevî şandeyeke hikûmetê serdana Tirkiyeyê kir.

Di wê hevdîtinê de şandeya Iraqê bi aliyên tirk re li ser mijarên der barê 8 dosyayên girîng ên li ser asta ewlekarî, aborî, xizmetkarî, enerjî, av, girêdana xeta trênê, vîza û pereyên dabûn sekinandin û dosyaya kurdî hevdîtin kir. Ji bo li ser van mijaran gavên pratîk bên avêtin jî aliyê tirk ji rayedarên iraqî xwestin ku Iraq di şerê li dijî PKK'ê hevkariya wan bike.

Wisa diyar e ku di nav hikûmeta Kazimî de hin kes vê hevkariya bi dewleta tirk re erê dikin. Peymana ku li ser Şingalê hatî girêdan jî mînaka herî berbiçav a vê hevkariyê ye. Dema mirov li çawaniya pêşveçûn û bûyerên li herêmê mêze dike, tê dîtin ku dewleta tirk bi her awayî zexteke mezin li Bexdayê dike. Vê jî bi destê PDK'ê dike. PDK di qada pratîk de darê destê tirkan e.

Her çiqas bi vê hevdîtinê dewleta tirk tengkirin û tavîzgirtina Iraqê bike armanc jî di bingeha xwe de amadekariyên êrîşek berfireh tên kirin. Em ji bîr nekin ku dewleta tirk ji sala 2015'an ve xwe ji bo şerekî mezin amade dike. Pêwîst e em baş bizanibin ku ev şerê mijara gotinê ye wê bi herêmekê ve sînordar nemîne. Li gorî plana hatiye çêkirin dewleta tirk xwe ji bo şerekî berfireh ê ku Başûr, Rojava û Şingalê digire nav xwe amade dike.

Bi vî şerî re dixwazin Tevgera Azadiya Gelê Kurd lawaz bikin û xwe bi her awayî li herêmê bi cih bikin. Bicihbûna li herêmê, plan dikin ku di warê erdnîgarî de başûr û rojavayê Kurdistanê ji hev qut bikin. Dîsa hewil didin ku xweseriya Şingalê ya bi keda hezaran cangoriyên civaka êzidî hatiye avakirin têk bibin. Nîşaneya vê ya herî berbiçav jî peymana 9'ê Cotmehê ya bi destwerdana dewleta tirk ve ji aliyê PDK û Bexdayê ve hatiye îmzekirin e.

Bi hevkariya PDK'ê re dixwaze hikûmeta herêma Kurdistanê lawaz bikin û wê bêîrade bihêlin. Bi vê hewl didin ku heya hilbijartinên Iraqê aliyên kurd lawaz bikin û di hilbijartinan de destkeftiyên wan ji destê wan bigirin. Bi vê planê dixwazin ber dilê Bexdayê xweş bikin. Ji ber ku herêma Kurdistanê çiqas lawaz bibe ewqas bi kêrî Bexdayê tê. Lewma li Bexdayê hin alî dixwazin di nav vê planê de cihên xwe bigirin.

Projeyek pir berfireh tê meşandin. Hin hêzên navneteweyî di nav xewna "ger Tirkiye li Iraqê bibe xwedî hêz wê pêşî li Îranê bê girtin" de ne. Dewletên wisa difikirin piştgiriya Tirkiyeyê dikin ku axa Başûr dagir bike. Diyar e dewleta tirk li ser vê projeyê gelek kes qanih kirine.

Lewma di vê rewşê de divê hikûmeta herêma Kurdistanê bi tu awayî tev li van planên qirêj nebe. Li dijî Tevgera Azadiya Kurdistanê şer neke, êrîşî gerîla neke. Ji ber ku ev êrîş dibe sedema ji desçûna destkeftiyên gelê kurd. Mînakên di referandûma serxwebûna herêma Kurdistanê de me dît ku ji bo gelê kurd çiqas giran bû. Ji bo ev êş dubare nebe, pêwîst e hemû aliyên kurd bi aqilîselîm tevbigerin.

Ji bo vê jî divê tu kes dilê xwe bi gotinên Hûlûsî Akar xweş neke ku piştî hevdîtina bi rêvebirên PDK'ê re gotibû "ji bo vê hevkariya tunekirina PKK'ê em kêyfxweş in."

Ji bo vê jî gotina şoreşgerê mezin Fîdel Castro ku dibêje; "Ger dijminê te pesnê te dide, wê demê bi te re pûştiyek heye" em bînin bîra xwe û em dilê dijminê xwe xweş nekin!

# Li Efrînê li dijî jinan sûcên şer

Navenda Lêkolîn û Parastina Mafên Jinan a Sûriyeyê der barê sûcên Tirkiyeyê ku li Efrînê hatin kirin de raporek amade kir û diyar kir ku di nava du salan de gelek jin hatine qetilkirin û rastî tecawizê hatine

Tirkiyeyê di 20'ê Çileya 2018'an de bi alîkariya Rûsyayê êrîşî Efrînê kir û piştî 58 rojan di 18'ê Adarê de Efrîn dagir kir. Di encama êrîş û dagirkirinê de sûcên hovane li dijî şêniyan bi taybet li dijî jinan pêk hatin. Tirkiyeyê bi hêzên xwe yên wek komên çeteyan, ji sûcên revandina jinan heta tecawîz, destdirêjî kirin û bi dehan jin qetilkirin.

Navenda Lêkolînan û Parastina Mafên Jinan a Sûriyeyê der barê sûcên ku li Efrînê hatine kirin de raporek amade kir û sûcên Tirkiyeyê û komên çeteyan ên li dijî jinan belge kir. Li gor encama raporê di nava du salan de li Efrînê 66 jin hatin qetilkirin, zêdetirî 149 jin hatine revandin, 178 jin jî rastî îşkence û destdirêjiyê hatin.



**Şênî ji ber êrîşan koçber bûn**

Di rapora ku sûcên Tirkiyeyê yên bi komên çeteyan dide kirin, bi taybetî hatin nirxandin. Navenda Lêkolînan diyar kir ku dewleta tirk tevahiya qanûn û peymanên navneteweyî binpê kiriye û ev tişt hat gotin: "Ji destpêka êrîşên dewleta tirk a dagirker û çeteyên wê yên li dijî kantona Efrînê, Girê Spî û Serêkaniyê, hejmara şêniyên ku ji ber êrîşan koçber bûne, gihaşt derdora milyonek sivîl, piraniya wan kurd in û bi rêjeya ji sedî 60'î jin in. Bi hezaran sivîlan jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûn. Zêdetirî 500 hezar sivîl ji şêniyên Efrînê yên resen û koçberên ku tê de bi cih bûne, ji ber êrîşên topan koçber bûn. Li gel wê çeteyên dewleta tirk dest danîn ser milkên şêniyan ku wekî xenîmet bin, bi rêya guhertina navên herêman û saziyên bi navên erebî û tirkî nivîsandin, meclisên herêmî yên girêdayî dewleta tirk bi rêveberiya çeteyan hatin avakirin."

**66 jin kuştin**

Navendê di raporê de bi bîr xist ku dewleta Tirkiyeyê ji sûcên ku komên çeteyan pêk tînin, berpirs e, ji ber dagirkirin, şer binesaziya civakê perçe dibe, rola jinan tê paşguhkirin, bi vê ve girêdayî jî newekhevî şax dide, asta tundiya li dijî jinan her diçe zêdetir dibe û ev tişt anî ziman: "Tirkiye û komên çeteyên wê li gund û navçeyên kantona Efrînê di îşkenceyê û topbaranê de zêdetirî 66 jin kuştin. Zêdetirî 149 jin revandine. Her wiha destnîşan kir ku 178 jin birîndar bûne û rastî tecawizê hatine. "

**Jinên bê nasname**

Her wiha Navendê der barê bûyerên kuştina jinên ku nasnameya wan ne diyar in de hin agahî parve kirin. Li gorî van agahiyan; di 28'ê çileya 2018`an de li navçeya Cindirêsê ya Efrînê jineke 55 salî ji ber topbaranê hate kuştin. Di 19'ê Mijdara 2019`an de jineke ciwan li bajarê Efrînê hate kuştin û cenazeyê wê li gundê Kanî Gewrikê yê navçeya Cindirêsê li ber kaniya gund hate dîtin.

**Jinên hatin revandin û windakirin**

Navendê diyar kir ku ji destpêka dagirkirina Efrînê ve zêdetirî hezar û 564 sivîl rastî tundiya dewleta tirk û çeteyên wê hatin û 149 jin hatine revandin, çaranûsa gelek ji wan nayê zanîn. Navên hin jinên ku çaranûsa wan nayên zanîn ev in: "Gulê Silêman ji gundê Basûtê ye û ji hêla çeteyên Mertala Firatê ve di destpêka 2018`an de hatiye revandin. Heyfa Casim ji pêkhateya ereb e, ji ber tawana têkiliya bi Rêveberiya Xweser re ku di nexweşxaneya Avrîn de hemşîre bû, hate revandin. Xedîce Mistefa Berko (23) ji hêla cendermeyên tirk ve, Emîne Hisên (60) ji hêla çeteyên Feyleq El-Şam ve, Ayat Ehmed Reşîd û Sefa Ibrahîm El-Şear hatin revandin. Di 11'ê Gulana 2018`an de jina bi navê Xedîce ji hêla îstixbarata Tirkiyeyê ve ji mala xwe ya li taxa Eşrefiye ber bi cihekî ne diyar ve hate revandin. Di 19'ê gulana 2018`an de Hesna El-Îd a ji pêkhateya ereb e ji hêla çeteyên dewleta tirk ve ji navçeya Cindiresê ber bi cihekî ne diyar ve hate revandin. Siyasetmedar Xalîde Silêman endama Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyeyê ji gundê Birka yê navçeya Mabatayê ji hêla ewlehiya siyasî ya girêdayî dewleta tirk ve ber bi cihekî ne diyar ve hate revandin. Ew cara duyemîn bû ku Xedîce tê revandin…"


**Sûc hatin belgekirin**

Endama Rêveberiya Navenda Lêkolîn û Parastina Mafên Jinan a Sûriyeyê Etiye Yusif piştî parvekirina raporê axivî û da zanîn ku dewleta Tirkiyeyê li gel zextên li bakurê Kurdistanê yên li dijî kesên ku mafên jinan diparêzin, li jinên herêmên dagirkirî yên Sûriyeyê jî dike. Etiye Yusif destnîşan kir ku Navenda Lêkolînan gelek sûcên li dijî jinan li Efrînê bi delîlan belge kirine û piştrast kir ku ji ber tirsê gelek jin nikarin sûcên li wan tên kirin, bînin ziman.

Etiye Yusif di dawiyê de ragihand ku wan ev dosya ji tevahiya aliyên têkildarî mafên jinan û mafên mirovan re şandine û bang kir ku sûcdarên sûcên şer ên ji hêla dewleta tirk ve li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê kirin, werin darizandin. ***QAMIŞLO***



# Derziya koronayê û rewşa pandemiyê



Dr. Eser Çetin

Wekî tê zanîn nexweşiya covîd-19'ê salek li dû xwe hişt û geşedanên baş û erênî jî çêdibin. Her çi qas hê rewşa xetere û nazik berdewam be jî li gel tevdîr û qedexeyan nexweşî hinekî sist bûye. Jixwe xala sereke jî ew e ku bi tevdîr û baldariyan berbelavbûna nexweşiyê kêm bibe. Ez zêde naxwazim li ser tiştên ku pir li ser hatine axaftin û tên zanîn bisekinim. Ji ber ku mijara derziya koronayê di rojevê de ye, ez ê li ser vê naverokê hûr bibim.

Di serî de em pênaseya parzayê ( perpûn, derzî,aşî) bikin. Parza ew tişt e ku şîfre û genetîka vîrûs, bakterî yan jî sedemên din ên nexweşiyan tên lawazkirin an jî pûçkirin û bi awayê dilop an jî derziyan didin mirovan. Sîstema laşê mirov jî bi vî awayî wan mîqroban nas dike û nahêle carek din ew mîqrob nexweşiyê di laş de çêbikin. Wekî em dibînin ji bo kontrol û pêşîgirtina nexweşiyan ciyekî aşiyan ê pir girîng heye.

Ji bo şewba koronayê jî ev yek derbasdar e û bi derketina aşiyê re jî hêviya sekinandina pandemiyê zêde bûye. Her çi qasî bi yek carê re wê pandemî neqede jî bi saya aşiyê wê çerxa berbelavbûna nexweşiyê bê şikenandin. Her ku biçe wê nexweşî têkeve bin kontrolê. Ew ê hejmara pêketiyan û nexweşan jî kêm bibe. Bi kontrolê re hêdî hêdî wê tevdîr bê kêmkirin. Wekî her kesî ez jî bi kelecanek mezin li benda wê demê me ku em ê ji maskeyan pak bibin û li jiyana xwe ya rojane ya berê vegerin.

Aşiya koronayê wekî du doz tê kirin. Hema hema li her welatî pêşî kedkar û xebatkarên tenduristiyê aşî bûn û dibin. Hêdî hêdî li gora rîska xwe, kesên temenê wan mezin, yextiyarên li cem malbata xwe najîn, kesên nexweşiyên wan ên kronîk hene, kesên li ciyê qerebalix dixebitin û hwd… kesên ji 18 salî mezintir wê tev bên aşîkirin. Ez bixwe jî aşî bûm û min ji xeynî êşek sivik a li ciyê ku derzî lêketiye tu gazinc û bandorên neyînî nedît. Ez hêvî dikim zêde bandorên neyinî yên cidî jî neyên dîtin.

Îja em werin ser mijara kirina aşiyê û nêzîkatiyan. Li her welatî li gora pîvanên wan û biryara hevpar a lijneyên wan ên tenduristiyê û rêveberiya wan, dest bi aşîkirinê hatiye kirin. Her çiqas kesên şikdar û li dijî aşiyê hebin jî bi gelemperî beşdariyek xurt û mezin heye ji bo aşîkirinê. Ez bixwe vê şikdariyê jî di cî de dibînin û mirovan fêm dikim. Lewre hewcedariya wan bi agahî û zanînan heye. Heta niha pir kesan pandemiyek wiha mezin nedîtine û pirs û nezanînên wan hene. Ev jî rewşek gelek asayî û normal e. Divê bi awayekî zanistî û zelal mirov bên hişyarkirin û ronîkirin. Dema ev yek çêdibe jî beşdariya aşîbûnê jî zêdetir dibe. Ez bixwe vê yekê wekî doktorekî ji gel û di nava gel de, pir baş dibînim. Bi hişyarî û danazînan mirov rêya rast dibînin. Ez hêvî dikim têra her kesî aşî bên peydakirin û her kes bikaribe bigihêje aşiyê.

Îja em vê bibêjin ku wekî her derman û tiştan, bandorên neyînî yên aşiyan jî dikare bên dîtin. Mirov ji ber hebek serêşê jî ( êşbir) dikare alerjî derbas bike yan jî dermanekî pir ji rêzê jî dikare li mirov neyê. Ev jî li gora kesan diguhere. Sîstema laşê her kesî ne wekî hev e. Hin kes ji adanên şîr, hin kes ji hêkan, hin kes jî ji goşt alerjî dibin. Loma îxtimala ji derzî û aşiyên koronayê jî mirov bandorên neyînî bibîne heye. Lê ev rêje pir kêm e û li gora lêkolînan neyînîyên tên dîtin jî bi piranî gazincên pir sivik in. Li gora kar û xesarê dema mirov datîne ber hev kirina aşiyê bi rêjeyek mezin derdikeve pêş. An na wê nexweşî mirovan bide ber xwe û bobelatek mezintir wê bê dîtin. Jixwe me çavdêriya rewşpandemiyê xweş kirin û mixabin me dît ku pir kesan jiyana xwe ji dest dan. Ji bo pêşîgirtinê aşî xaleke pir sereke ye.

Dema pandemî nû derket û nexweşî pir berbelav dibû ji bo tedaviyê û ji bo aşiyê çavên me li rê bûn. Heta niha dermanekî ji sedî sed ji bo covîd-19'ê taybet nehate dîtin lê aşî hatiye dîtin. Îja li hemberî aşiyê divê em ne zêde şikdar bin. Em zêde teoriyan amade nekin û li tiştên spekulatîf jî guhdar nekin. Hatiye peyitandin ku aşî ji bo kontrola nexweşiyên têger pir û pir girîng e. Îro roj bi saya aşiyên zarokan pir nexweşî eradîke bûne ( nema tên dîtin) an jî pir kêm têne dîtin. Di demên pêş de wê xatirê aşiyê bêtir jî bên zanîn, lewre wê dane û belgeyên têkûz bên ber destên me. Û ez bi mirovan jî bawer im, ew ê li gora rîska xwe beşdariyek mezin nîşan bidin.

# Nîşaneyên nakokiyên Amerîka û Rûsyayê



Rêveberiya Amerîkayê ya nû plan dike ku ji ber rola di êrîşên elektronîk de hin cezayên din li Rûsyayê ferz bike. Nîşaneyên pêşîn ên nakokiyên di navbera Washington-Moskovê de bi vî awayî her diçe diyar dibe.

Derbarê stratejiya rêveberiya nû ya Amerîkayê li ser têkiliyên bi Rûsyayê re, berdevkê Pentagonê gotibû ku "Stratejiya me li hemberî astengiyên ku Rûsya derdixe, diyar e."

Du rayedarên payebilind ên Qesra Spî destnîşan kirin ku rêveberiya nû plan dike ku hin cezayên din li Rûsyayê ferz bike, ji ber rola wê di êrîşên eleketronîk ên li dijî saziyên fermî yên Amerîkayê de.

Li gorî rojnameya Washington Postê ku agahiyên xwe spartin rayedarekî payebilind ê Qesra Spî, dê ceza li gorî nirxandineke îstixbaratê li ser çalakiyên dawîn ên Rûsyayê bên ferzkirin.

Li gorî rojnameyê tê payîn ku di raporê de êrîşên eleketronîk, asta mudexeleya Rûsyayê di hilbijartinên serokatiya Amerîkayê yên dawîn de û bikaranîna çekên kîmyasal li dijî serokê muxalefeta Rûsyayê Alexey Navalny bên destgirtin.

Rayedarekî din ê payebilind ê Qesra Spî diyar kir ku li gorî wan nirxandinan dê bersiva guncaw li hemberî êrîşên hefteyên dawîn ên Rûsyayê, bê diyarkirin.

Li aliyekî din, Wezareta Karên Derve ya Rûsyayê diyar kir ku ew bi hêvî ne ku rêveberiya nû ya Amerîkayê hevsengiyê di têkiliyên bi Rûsyayê re pêk bîne. ***WASHINGTON***

# Xeyalên 'Tûrana Mezin'



Kurdistan Lezgiyeva

Tirk li Kazakistanê bi rengekî çalak tevdigere; personelên fermandariya herî jor a artêşa Kazakistanê perwerde dikin û têkiliyên aborî bi pêş dixin. Kazakistan neft û berhemên neftê, metal, genim û madeyên din ên xav difroşe Tirkiyeyê. Tirkiye jî qumaş, kinc, pêlav, alavên pîşesaziyê, kelûpelên malê û alavên avahiyê ji Kazakistanê re peyda dike. Tirkiye di afirandina pargîdanî û pargîdaniyên hevpar ên bi beşdariya biyaniyan de li Kazakistanê piştî Rûsyayê di rêza duyemîn de ye.

Enqere di warê aborî de, di pêşbaziya Moskov û Pekînê de hîn pir bibandor nîne lê di warê siyasî de, hevkariya wê ya bi Nur-Sultan re her diçe geş dibe.

Wek tê zanîn Tirkiye yekemîn welat bû ku serxwebûna Kazakistanê nas kir û pê re têkiliyên dîplomatîk saz kirin.

Ji 2009'an vir ve, di navbera Kazakistan û Tirkiyeyê de peymana hevkariyek stratejîk hate îmzekirin. Ji bo hevkariya siyasî, komeke xebatê ya plansaziya stratejîk a hevpar hîn heye û bi salan e dicive. Kazakistan û Tirkiye di çarçoveya rêxistinên dewletên tirkî dikin yek de têkiliyên wan hene: Civata Hevkariyê ya Dewletên Tirkîaxêv an Civata Tirkî (Azerbaycan, Kazakistan, Qirgizistan, Ozbekistan û Tirkiye tê de, Tirkmenistan difikire ku tev li rêxistinê bibe); Rêxistina Navneteweyî ya Çanda Tirkî (navenda rêxistinê li Enqerê ye, lê serokê giştî yê rêxistinê wezîrê berê yê çandê yê Kazakistanê Dusen Kaseinov e); Meclisa Parlamentoyê ya Dewletên Tirkîaxêv (di 2008'an de bi pêşengiya Serokê Kazakistanê Nursultan Nazarbayev ve hate avakirin).

Wekî din, elîta Kazakistanê bi xurtî helwestên pan-tirkî dihewîne. Ji bo xweşkirina Bakûyê, Kazakistan di sala 2014'an de bi behaneya neçareserkirina (ji perspektîfa Azerbaycanê) pevçûna Qerebaxê hewl da ku têkeve Ermenistanê di Civata Aborî ya Avrasyayê de asteng bike. Ji ber vê yekê, Enqere 'hêza xwe ya nerm' baş bikar tîne û ji ber ragihandina 'biratiya tirkî' û projeyên perwerdeyê li Kazakistanê xwediyê pozîsyoneke baş e. Îro Tirkiye di Transkafkasyayê de asê maye û di bin ala ramana Pan-Tirkîzmê 'yek gel - şeş dewlet' de li Asyaya Navîn bandora xwe bi pêş dixe.

Rûsya nikare Kazakistanê ji dest bide: bi kontrolkirina axa wê, ew dikare bandorê li pêvajoyên li welatên din ên herêmê bike. Pêdivî ye ku li vî welatî hêzên mezin ên Pro-Rûsî werin damezrandin nemaze, ji ber ku nifûsa rûsan a li Kazakistanê, ji ya hemû welatên Asyaya Navîn pirtir e.

Di heman demê de, elîta Rûsyayê divê bizanibe ku bêyî îdeolojiya neteweyî wekî îdeolojiya neteweya siyasî ya sivîl a rûsî, Rûsya wê bi têkçûnek dîrokî ya bêserûber re rû bi rû bimîne. Heger tenê xwe bispêrin vê îdeolojiyê, dibe ku mirov wê 'hêza nerm' biafirîne ku bihêle Rûsya li hember dijwariya Pan-Tirkîzmê bisekine.

Niha baweriyek heye ku hêza têkiliyên navbera Rusya û Kazakistanê nikarin bibin qurbanê hestên neteweperestî yên ku ji bo mebestên heyî tên afirandin. Kazakistan bêguman ne Ukrayna ye ku rûsofobî 150 sal in ji hundur û ji derve wekî ramana sereke ya neteweyî hatiye afirandin.

Lêbelê, di sedsala 21'ê de, hemû pêvajo ji berê pir zûtir pêş ve diçin û kaosa di kar û barên navneteweyî de çalakiya bilez û diyarker dike. Dîroka sedsala 20'î fêr dike ku neteweperestî, her çend ew ji sifirê were dahênandin jî, pir zû dikare bibe sedema trajediyê. Rûsya hêza super a nukleerî ye. Ji ber vê jî qabîliyeta wê heye ku bi yek derbeyê hemû cîhanê tune bike.

Erdoganê ku neo-osmanîbûn an jî pan-tirkîzmê dixwaze û gav bi gav bi hemû hêza xwe hewl dide bibe 'bavê nû yê neteweya tirk" û hem jî, bi îdeal, celebek hakem û 'bavê' giştî ya hemû gelên tirkîaxêv.

Rêya pan-tirkîzmê her tim rêya leşkerî, rêya derxistina gel û neteweyên din e. Ev ramanek prîmîtîf e, lê pêkanîn pir dijwar e. Bêguman, avakirina 'Tûrana Mezin' ne pêkan e, lê diyar e dê di hewldanên afirandina wê de gelek xwîn bê rijandin.




# Ez ji beriya Mêrdînê me!

Konê Reş

Ezbenî! Ez ji beriya Mêrdînê; kezeba Mezopotamiyayê me... Ev beriya ku ji destpêka mirovahiyê ve şînwar lê hatine avakirin, hesp lê hatine kedîkirin, genim lê hatiye çandin, erebe û tekel lê hatine çêkirin... Erê, ji mêj ve gelek şaristanî li ser axa wê hatine avakirin, gelek nijad tê re derbas bûne, pemayên xwe, şop û şûna xwe li ser axa wê hiştine wek; Til Helef (Waşokanî), Til Birak (Qehat), Til Bêder (Nabada), Til Erbîd (Aşnakom), Til Mozan (Orkêş), Çaxir Bazar, Girê Êlûnê, Girê Bihemdûnê û bi sedan girên dîrokî yên din ku li beriya Mêrdînê belav in.

Di ser axa wê ya dîrokî re Sobarî, Somerî û Akadî derbas bûne... Artêşên Hûriyan, Hisiyan, Mîtaniyan û Aşûriyan şerê hev kirine û tevan tovê xwe di nav axa wê de çandine. Li ser axa wê, gelek caran fars û romê şerê hev kirine û hev westandine. Di esmanê wê de dengê oldarên Somerî û Babiliyan bilind bûye û li ser peravên çemê wê duayên xwedênasên Mîtanî û Aramiyan li hev vegeriyaye. Erê, eger Cizîra Binxetê dilê Mezopotamyayê be, beriya Mêrdînê kezeba wê ye û ez neferek im ji vê beriyê.



Ezbenî! Zargotina me, folklora me bi pend û gotinên pêşiyan dagirtî ye. Ewên ku ji encamên serboriya hezarê salan ve, di nav civaka xelkên beriya Mêrdînê de rûdane, baweriya gel bi wan hatiye û ji gel re bûne wek yasayên mîna: "Kesê ne kes be nabe kes, kurtanê kerê nabe etles" an "gelekî nede ber dasê ku das nemîne asê".

Ezbenî! Hê jî rewşenbîriya me mîna çemê Ferat, Dicle, Xabûr, Zab û Hêzilê diherike. Ava gelek rûbar, zê, kanî û cogên kurdistanî tev lê dibe û kes nizane destpêk ji ku ye. Belê ezbenî, îro roj, 'tu hêvî ji me kurdistaniyan re nemaye' ji bilî ziman û rewşenbîriya me û hebûna me ya şaristanî di nav xelkên cîhane de! Pêdiviya me bi semyanekî rewşenbîrî heye, semyanekî ku afirêner û spehî be. Pêdiviya me bi pisporên ramyarî û rewşenbîrî heye, ewên ku ronahiyê li pêş gel vêxînin û gel di asoyên berfireh re derbasî pêşerojên geş û rojên ayende yên xweş bikin.

Belê ezbenî, neyar ji çar hawêr ve tixûban li ber me datîne. Rêka çûk ji ber me digire, tev derfetên bêhinvedanê bi sînor dike. Welatî jî, ji neçarî, berê xwe didin dergehên xwedê; li sirgûnî û zîvariyan belav dibin. Xwedê li hawara kesekî nehatiye, aqil daye, mejî daye û ji evdê xwe re gotiye; rab, ez bi te re.

Ezbenî! Dema ku ez li rewşa welat û zimanê welatiyên xwe diponijim, ji min ve diyar e ku zimanê me maka gelek zimanên Rojhilata Navîn û Mezopotamyayê ye. Belê ezbenî, çendî em zimanê xwe bikar bînin; pê biaxifin, bixwînin û binivîsin, em qenciyê li xwe dikin, resenî û mezinbûna zimanê xwe diparêzin û di nav xelkên dinyayê de berz û bilind dikin. Ezbenî! Bawer bikin, tirsa gelek dewletên cîran ji zimanê me heye! Ji ber ku dîrok û hebûna me di zimanê me de ye. Gelek caran, li axa welatê xwe diponijim û ji xwe re dibêjim; ax dayika me ye; her tiştê me ji axê ye û li axê vegerin, pêwîst e em li vê axa ku wek dayika me ye miqate bin. Erê, gereke em li axa xwe miqate bin.



Necat Ayaz

## Annus Horribilis

Annus Horribilis gotineke latînî ye ku ji sala 1891'ê û vir ve ketiye nav hin zimanên ewropî. Gotin ji bo sala bûyerên gelekî xerab tê de qewimî ne, tê bikaranîn û wateya wê ya herî nêzîk a di kurdî de "Sala Reş" e. Dema mirov der barê sala borî de bixwaze nirxandinê bike, bêguman du peyvên herî bikêrhatî ên ji bo vê salê Annus Horribilis e.

Par, şer û aloziyên mirovahiyê yên di nav xwe de û sefera wê ya 300 salan a li dijî xwezayê, bêyî rawestan domiyan. Aktorên navneteweyî û yên herêmî bi alîkariya xwe ya rasterast an veşartî, şerên navxweyî yên li welatên Asya û Afrîkayê gurtir kirin. Ji Afganistanê heta Lîbya û Yemenê, Rojhilata Navîn bû qada şerê wesayetê û windahiyên însanî û aborî qat bi qat zêde bûn. Îsal, pêla serhildanan a wekî Bihara Ereban dihat binavkirin, ket sala xwe ya 10'emîn û niha tu şik û guman neman ku di encama vê proseya ji hêsir û girînê de bindestiya gelên Rojhilata Navîn girantir bû.

2020 li seranserê cîhanê bû saleke zêrîn ji bo rejîmên otorîter û diktatoran. Taybetiya rêvebiriyên bi vî rengî ev bû ku hemû jî di lîstika bi navê "demokrasiyê" de ji sindoqê derketibûn. Ev rêvebirî wekî cinê ji şûşeyê derkevin, hişk bi desthilatê girtin û êdî nema ew berdan. Serokê Amerîkayê Trump bi dijminahiya xwe ya li dijî xweza û mirovahiyê û bi zimanê xwe yê wekî jehrê, ji bo rêvebirên bêwijdan ên li çaraliyê cîhanê bû rolmodelek. Li Brezîlyayê Jaîr Bolsonaro, li Hindistanê Narendra Modî, li Tirkiyeyê Tayîp Erdogan, li Macaristanê Vîktor Orban û hin lîderên din ên çepelkar bi polîtîkayên xwe yên hilweşîner dan ser rêya Trump. Rûsya û Çîna ku tu car demokrasiya civakî nebûye para wan, tev li NATO û Amerîkayê bê hed û hesab mîlîtarîzmê bi pêş xistin. Di serî de ev her sê dewlet, 11 dewletên cîhanê par ji bo mesrefên leşkerî nêzîkî 1.5 trilyon dolar pere xerc kirin. Bi vî awayî, ji atomê bigire heta çekên biyolojîk û yên konvansiyonel, cîhan bû depoyeke mezin a çekên kujer.

Par, mirovahî di şerê xwe yê çavkor ê li dijî xwezayê de zêdetir nêzîkî serkeftina dawî bû! Li Daristanên Amazonê ku wekî "pişika dinyayê" tên pênasekirin, bi milyonan donim darên tropîkal bi teşwîqa dewletê hatin şewitandin. Ji ber germahiya avhewayê dar û deviyên Awustralyayê jî hew deyax kirin û ji havîna 2019'an heta havîna par, 6 meh bênavber şewitîn. Bi dehezaran donim erd bi hemû şînahî û sewalên tê de bûn kavil, dûmana şewatê bi hefteyan asîmanên bajarên mezin reş kirin û paşê jî di ser Okyanûsa Pasîfîkê re gihîşt heta Amerîkaya Latîn. Guherîna avhewayê li gel şewatan, li gelek aliyên cîhanê bû sebeba bahoz, barana zêde û lehiyên har û bi hezaran mirov bûn qurbana van karesatan.

Helbet divê em şewba koronayê ya wekî xewnereşkê daket ser cîhana me, ji bîr nekin. Bi zêdetirî 90 milyon nexweşan, 2 milyon miriyan û zirarên bêsînor ên ji bo jiyana civakî, ev şewb bû dijminê yekemîn ê mirovahiyê, lê di rastiyê de, bobelata koronayê jî tê de, her çi par bû belaya serê cîhanê, ji ber şerê mirovahiyê yê li dijî xwezayê pêk hatin û lewma jî dikarin wekî "karesatên mirovahiyê" bên binavkirin. Yanî bi gotineke din, mirovahî ji ber sûcên xwe yên li dijî xwezayê hat ber têkçûnê. An jî bi gotineke din mirovahî çi çinî be par wê hilanî. Lewma jî 2020 ku sala karesatan, şewatê û şewbê bû, ji bo cîhanê û mirovahiyê Annus Horribilis e!

# Tecawizkar bi dawulan ame vervazî kerdene

Meral Ozel

Çend serranê peyênan fekê kam kî beno ra, şîddetê ser cinîyan, qetilkerdena cinîyan ser o qisey keno. Çiqas bî zêde hûmaran danê. Zanîme ke no hîn ju rey de nêbî... Wastena îqtîdar, wastena sîstemê kapîtalîst cinîyan ra nawa. Bêveng vinderî, qesê nêvajerî, jê kole camêrd se va hîn bikerî. Na polîtîkaya îqtîdarî wextê mehkemekerdişê qetilanê cinîyan de kî xo musnena. Pêro na nejdî bîyayene, na polîtîkaya bêceza raverdayen û quwetêko qilêrin dana camêrdan. Îqtîdar ra piya zerê çeyan de kî qilêrîya camêrdan vila bena û xo musnena. Cinîyê ke nêbenê kole cinîyê ke na qilêrîya camêrdan bi vengê berz anê ra ziwan benê hedef. Armancê sîstemî û camêrdan ju yo. Cinî ma rê bibî kole.

Hewteyo verênî de çapemenîye de xeylê ca girewt. Mêrdîn de keso bi namê Osman Çur, tecawizê çena birayê xo kerdo. Ameyo pê girewtene dima ra kî ameyo raverdayene. Vernîya hepsî de tecawizkar hetê keyeyê xo ra bi dawul û zurneyan ame vervazî kerdene. No bîyayîş asmên ra bi gere kerdena waya domana 17 serrîne vejîya werte.

Domana 17 serrîne hetê apê xo ra raştê tecawizî yena. Asma Temmuze de di reyî rojanê 4 û 5'ine de raştê tecawizê Osman Çurî yena. Hende kes dormê domana 17 serrîne de esto hama kes nêyî nêvîneno, pênêhesîno ya kî ju vatîse de bîna ebi xo kî bese nêkena kes de nêyî ser o qisey bikero... Yena tehdît kerdene, tersê xo ra bêveng manena. Zanîme teber de ti se beno wa bibo qusir, xeta suc tim yê cinîyan o. Tacizkar û tecawizkarî xo nîya pawenê û naca ra quwet gênê.

Tecawizkar di reyî pêceriyo, dime ra kî ameyo raverdayene. Reya pêyene waxto ke ame teber mordemê xo bi dawulan şîyî verniya tecawizkarî. Cinî û camêrdî bi tilîliyanê xo şîyî vervazî kerdena tecawizkarî. Mordem nêzaneno na qilêrîye çitur bîyaro ziwan. Hem tecawizkar hem zî ê ke şîyê vervazî kerdene jê jubînî. Zîhnîyetê nînan ju yo. Çena birayê xo rê tecawiz kerdo, naya benê sa. Her waxt sûc cinîyan de yo. Ju camêrdî, ju apî tecawizê çena birayê xo kerdo. Gere kes nejdiyê xo ra nêverdo ke ravêro, heme keye pêro ti vana tewa nêbiyo, ju cayê durî ra kes tewa vato.

No zîhnîyeto tecawizkar teyna sîstemî ra, îqtîdarî ra nê, dormê xo ra, mordemanê xo ra kî quwet gêno. Eke wertê koma xo de, hometa xo de cezaya sucî bivînê, hende rehet hêrîşê cinîyan û domanan nêkenê. Çitur keso ke çênaya birayê xo rê tecawiz biko, bi dawulan yeno vervazî kerdene. Hîn ke nêbo mordem xo ra, dormeyê xo ra û cîrananê xo ra şerm keno.

Ju çeku esta. Ensest; yena manaya zerê çeyan de hetê kesanê keyeyîra rastê taciz û tecawizî ameyî. Xeylê keyan de, xeylê kesî raştê nê bîyayîşî ameyî. Wexto ke nêame qiseykerdene, nê ser o kes nêşi, na qilêrîye yena na merhele. Xeylê bîyayîşê ensestî ameyî wedernayene. Wexto ke vejîya werte en zêde cinî bena sucdar. Camêrdî yenê seveknayene, cinîyê pîlî ke zerê çeyan der ê, domanîya xo de raştê nê hêrîşan ameyê, tim dardê we, nika kî domanan û tornanê xo ra kî naye wazenê. Nê taciz û tecawizkarî bi polîkayanê îqtîdarî piya zerê şarî de her ke şî bêehlakîye xo rê kenê. Pêro na qilêrîye waştena sîstemî ya.



Tacizkar û tecawizkarê çena birayê xo bi dawul û zurnayan ame vervazî kerdene. Hard û asmên lete bibo. Çitur beno ke hende bêvengîye esta…

# Vîjdanê şaran de çilkê awe bî: Hrant

Mehmet Seyîtalîoglu

Çarês serre naye ra ver, mesûlê karê nuşteyanê rojnameyê Agosî, Hrant Dînk verê rojname de ame qetilkerdiş.

Hrant ebe hîsê cinawirîye bi kulturê nîjadperêtîye dewlete o qetil kerd. Na nîjadîye a roje ra tewr ver sedserre no merhalêde xirab, na gonîwerîye hetanî ewro dewam kerd.

Dostê ey bi se hezaran kesan a rojere nate, ey ro wayîr vejîyenê. Vat ke 'Ma pêro armenî yî.'

Qet roje na dewleta nîjade kerdenanê xo ra nîyama têrî. Dewleta osmanîye ra bigê cumhurîyet ra hetanî ewro. Kar hermanê ma bindesta mend. Xelasa ma bi destê ma wa. Xo rê wayîr bîme o yo ke xilase ebe şaran bîvîno, înan de dest bidîme jubînî. No hewro sîya, na raya xirabine ra û na nîjadîye şîkînîme bertaraf bikîme.



Genc bigencîya xo, suxte bisuxteyîya xo, cînî bicinîyîya xo, karker bikarê xo, şiwan û gawan ebe şiwanî û gawantîya xo, roşnvîr bi karê xo, sîyasetkar ebe karê xo ma pêro pîya dest bidîme, nê barî kenîme ra.

Qetlîyamî hetanî ewro serede Roboskî, Suruç, Garê Anqara, Sêwas, Gazî, Umranye .. ûsn. Sedserra peyêne armenî ebe surgunan û qirkerdişan rîyê erdî ra kerdî pak. Ebe daye nêmendî. Hetanî roja ewroye na nîjadîye dewam kena. Tarîxê kurdan û armenîya nîyadîme, her game û her seate mafê şaran ebe destê kolonyalîstan bîyo. Gonîya netewa ma destê kolonyalîstan de esta. Ma gere dewaya xo rê dozdar û dewadar bîme.

Ebe sîyaset û kulturê dewleta nîjadîye raye danê serserîyan. Serserî taxim qewet û hêzê ebe dewlete raye ra şonî. Ebe dewlete organîze benî.

Dadgehê cezayî, bêceza piştî danî nê serserîyan.

Dadgeh vernî welatê ma kolonî de qanûnan ana ca. Badê nê qanunî pero Tirkîya de benê qanunê esasîyî. Nika pêro şar binê bandora gonîwerîye der yî.

Hrant royê şaran de estareyê şew o. O çulîkîn o. Raye musneno ma. Ma ey xo vîra nêkenîme.

---



## Dewey Ma

Cemîl Oguz

cemilo@diyarname.com

## Mase

Mase heywanêke awî yo. Ger mîyanê awe ra vecîyeno, mireno. Helbet tewir tewirê maseyan estê; werdî, qicî, pîlê, qiraseyî... Heta balîna zî cureyêke maseyan ê. Serê maseyan de vatişê tewir tewirî estê.

**Mesela:**

Tenê ke vîrê cê xurt nêbo te ra vanê "Bîrê masî to dir o". A raşt vanê, mase bê vîr o, ti zî bê vîr ê. Vîrê maseyan 3-4 sanîyeyo. Erê, tenî 3-4 sanîyeyo. Dima ra heme çî keno xo vîr û loma kuno torey merdiman. Kam wazeno zey maseyan bê vîr bo?

La heto bîn ro maseyan de vîtamînê Omega 3 esto û vanê Omega 3 qeybî merdiman muhîm o. Yanê hetêke ro maseyî bê vîr ê, feydeyê cînan çinî yo, la heto bîn ro bi Omega 3 vîtamînêke muhîm danê merdiman.

Mesela zî tam tiya dest pa kena: Dinya serê çi yê muhîman û çiyê ke muhîm niyê de vindena. Her çîkew ma vanê muhîm nîyo, wextê cê yeno zehf beno muhîm.

Bi kilmî ma vacê maseyî muhîm ê û semedê muhîmê her demsal de ê yenê werdiş. Zimistan tewr zehf maseyê mîyanê behran, la hamnanan maseyê golan û maseyê çiftlikan yenê werdişî.

Heto bîn ro maseyî sînoran nas nêkenê, azad ê û helbet leze yenê xapênayişî zî.

Ma kurdî zî henî ro masan şîyê. Ma zî baş ê, feydeyê ma qeybî însanîyetî esto, la heto bîn ro ma zî bê vîr ê; vîrê ma tay o. Çiyê hameyê serey ma, ma leze kenê xo vîra.

Ma qalê karakterê maseyan kerd. Karakterê her heywanêke tewir bi tewir o. Karakterê şêrî, ê liwe, ê herî, ê heşe, karakterê kesan, karakterê morcelan, yê teyran...

Û karakterê kurdan. Ma go gorey kamco karakterî ra game berzin? Ma her jo, karakterê ma zey kamco heywanewo? Zey mase yo, yan zey liwe yo?

Temam ferqê însanî esto, însanîn wayîrê aqiliyê, ê û heywanî nêbenê zey jobînî. Xo ra ez zî înan nêkena zey jobînî. Însanî bi aqil ê û bi aqilê xo rayra şinê. Ene rastîkewa, la heto bîn ro ma çi rê heniyan ra vanê, "Vîro to zey vîrê masî yo", "Ti her ê", "Bawne te ra, zey şêrîyo", "Her teyr refê xo dir firiyeno"...

Jo; enka zimistano, ger îmkan bibo maseyan borê, çiqa mase bê vîrî bê zî, goştê cînan qeybî însanan zehf baş o. Di; Ma xo bi xo bawnê karakterê ma û kamco heywanî zey jobîniyo û persey "Çirê" xo ra bikenê. Dimay ene perse zî ma ewca ra dersêke vecê. Ma go bibê zey teyran û têdir bikoy hewa, yan ma go zey kutikan her têdir şer bikerin? Ma go bibê zey cisnê mêşine, yan ma go bibê mase û di torey masegirotoxan de bibê werê şanî?

Bi kilmî; Merdim eşkeno şikil bido karakterê xo. To çawey şikil da karakterê xo, şarê to zî bi ew awe şikil gêno.

## Şûjin

Dildarê Amedê

### Siwar bû an peya bû?


-Bila serê te sax be.
-Spas mala te ava.
-Xalo yê bavê te kuşt siwar bû yan peya bû?
-Kuro ma çi ferq dike, siwar be yan jî peya be, bavê min êdî çû.

### Çi halê te ye?

-Xalo, tu çawa yî?
-Halê min tune ye Berxo.
-Serê te diêşe?
-Her deverê min diêşe.
-Nava te diçe?
-Bi zorê xwe digihînim destavê.
-Tu tama xwarinan dikî?
-Na her tişt bêtam e?
-Xalo xwe netirsîne lê teqez tu bi koronayê ketiyî.
-De here qeşmerê heram min henekê xwe bi te dikir. Tiştekî min tune ye. Min got belkî bi vî awayî tu bela xwe ji min vekî û nema werî ba min...!

### Tu çima karekî nakî?

-Birako tu çi dikî?
-Cîranê hêja, wele ez karê rojnamevaniyê dikim. Di ber karê xwe re nivîskariya xwe dikim, lê ji ber ew kar pere nake min qehwexaneyek vekiribû, êvaran diçûm wir ew jî ji ber koronayê hat girtin. Niha ez di dema xwe ya vala de karê wergerê dikim. Edîtoriya malprekê dikim û carnan jî li ser malperên civakî hin dîmen û nûçeyan parve dikim.
-Birako tu çima karekî ji xwe re nakî?
-Cîran ma evqas kar ne bes in?
-Na Birako ne bes in ma te ne bihîstiye ku dibêjin 'xwediyê heft karan bê kar e'. Te heft kar hejmartine, min jî nas kir ku tu bêkar î...!




# Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî me ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin.

**1-** Mamê mino mamanî
Bizina kal e
Li ser mal e
Ne didoşin
Ne difiroşin
Kî dizane ew çi ye?

**2-** Tiştek min heye
Bizina kal
Ser girê evdal
Hir ho dikim
Hey ho dikim
Nayê xwar
Hûn dizanin çi ye?

**3-** Tiştek min heye
Bûka mîrê Hesena
Heft kur û heft keçê destan e
Ne şîr e ne pizwan e
Ew çi ye gelo?

***Çavkanî:***
***Mamikên Botanê***

**Bersivên me ev in:**
**1-** Mêşa hingiv
**2-** Spî, sipih
**3-**Mirîşka kurd û çêçikên wê

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin. De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Me qurmê darê birî**
**Jûjî ji bin gindirî**
**Xwe li hev kir girêk**
**Bû nola girêkek tirî**




→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Melayek ji wê va tê**
**Şaşî wî li serî**
**Şaşê tu çi şaş î**

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe:
**Mifta mitfeqê**

***Çavkanî: Mihemedê Kurdo***

# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Cureyekî heşeratên firinde ye 3. Xwarina sereke
5. Reqis, govend 6. Kulîlkeke ku wekî derman tê bikaranîn, ji bo serî baş e
7. Rengek 9. Hejmarek 12. Mangirtin 14. Baş
15. Koletî, perestî 17. Pirç
18. Sewaleke kedî ku ji bo goşt û şîrê wê tê xwedîkirin
22. Zaravayekî kurdî

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Daneke salê
2. Serhildan, xebata çekdarî ya ji bo standina mafê rewa
3. Bersiva neyênî 4. Teze, ne kevin
5. Hunermendekî kurd ....... Yusuf
7. Heyam, çax 8. Tav
10. Belê, libê
11. Gelekî mezin ê li Rojhilata Navîn
13. Darvekirin 14. Qulp, destik
16. Navê meha destpêka biharê
19. Roja em tê de ne
20. Heywaneke kedîkirî ku ji bo hilgirtina baran dihate bikaranîn
21. Hewcedarê avê, dema qirika mirov zuha dibe
23. Cihê ku arvan lê tê hêran

Bersiva hefteya borî





# Pehîzok û heyranokan şîn girêdaye

**Botan jî yek ji wan warê ku landika çand û zanînê ye, serkana hunermenda ne ku yek ji van şalulê Botanê Hunermend Cemalê Mihê bû, ew berî çend rojan, ji asîmanê me xwuricî û koça dawî kir**

Rûkiye Ozmen

Mirovên awir mest, ji efsûniya xwezayê, guhên wan dengên qedîfe dibîhîzin, rondikên wan carna ji janan û carna jî ji şadbûna mijangan şeh dikin. Kelecan û hişyariya wan, harmoniya hizir û hestan diwelidîn li rabirdû û asoyê, li ser dika dil. Warê raman lê berz û hest lê gur bin, wê her huner lê biafire. Botan jî yek ji wan waran e ku landika çand û zanînê ye; serkana hunermendan e ku yek ji van şalûlê Botanê hunermend Cemalê Mihê bû. Ew berî hefteyekê, ji asîmanê me xuricî.

Pehîzok, lawik, heyranok û xizêmok sêwî hiştin û oxira xwe xêr kir. Cemalê mihê bi dengê xwe yê efsûnî bi dengbêjiyê, bi taybetî bi gotina peyîzokan navdar bû. Li Botanê stîlek taybet heye ku ji wan re, peyîzok, serêlî, heyranok, bêlite yan jî giranî dibêjin. Tenê hunermendên vê herêmê dikarin vê stîlê baş bi kar bînin ku pêlên dengan diçin jêr û jor, carinan nerm û carinan hişk dibin.

Ev stîl li Botanê li gor forma sirûştî, fonetîka dengê ji qirikê cuda derdikeve. Dema mirov bahsa peyîzokan dike, dengê rehmetî Fadilê Cizîrî, Salihê Şirnexî û Cemalê Mihê di guhê mirov de pêl dide.

Hunermend Cemalê Mihê yek ji dengbêjên navdar ên Botanê bû. Wî stran ango lawik, peyîzok, serêlî, heyranok, bêlite gotine. Her wiha tê gotin ku bi taybetî stranên mîna "Hey li min Evdalo", "Çiyakê Cudî" "Seydiko", "Mîranê", "Keçkê Dînê", "Hey lo Delal", "Eman Neman Çiyayê" û gelek lawikên din wî çêkirine. Bi taybetî dema Cemalê Mihê "Mîranê" dibêje, hestên mirov dikevin cezbê û dilê mirov har dibe, xwe di singa mirov de hildavêje. Dema dibêje, "Were were lê mîranê hoy lê lê, hey hey heyla li min mîranê...." Lawika Çiyayiyê li ser devê hemû Botiyan e. Ku dibêjê, "Eman Neman, de aman neman de rabe çiyayiyê..." dar û ber li ber dihelin.

Hin taybetiyên dengên stranên Botanê ku wekî, lawik, peyîzok, serêlî, heyranok, bêlîte tên katorîzekirin wiha ne:

**Lawik**

Lawik li herêma Botanê ji bo stranên evîniyê tên gotin.

Li hin herêman jî weke kilamên dilan, stranên dilan, goranî û kilamên evîniyê jî tê binavkirin.

Mijarên lawikan evîn, hezkirin, veqetîn û negihîştina evîndaran e.

**Pehîzok**

Pehîzok dema êdî koçer ji zozan û çiyayên dadikevin deştê û dikevine demsala payîzê tên gotin.

Ew dem dema ji hev-veqetîna evîndaran e.

**Heyranok**

Heyranok stranên ku mijarên wan li ser negihîştina evîndaran, evîn û jana evînê ne.

Weke ku keç û kurê evîndar li pêşber hev bin qala evîn, jana evînê û astengiyên li pêşiya evîna xwe dikin.

**Bêlîte**

Bêlîte stranên dawetan ên folklorîk in. Ji bo adaptekirina karê ku tê kirin tên gotin.

Herî kêm jî hêla du kes an jî du koman ve tên gotin.

Di gelek bêlîteyan de dîsgotin yanî dubare heye. Kes/koma pêşî ji stranê bendekê distîre û kes/koma pêşber jî heman bendê dubare dike.

Bi vî awayî heta stran diqede berdewam dike.

**Şeşbendî**

Şeşbendî ew cure stran in ku di dîwan û şevbihêrkan de herî kêm ji hêla 2 an jî zêdetir kes û koman ve tê strandin.

Berê di koşk û dîwanên mîr, beg û axayan de dengbêjan weke pêşbirk an jî kewxurê li hember hev stran distiran heta stranên aliyekî xilas dibûn an jî dev jê berdida didomand.

Destan di nav dengbêjiyê de beş an jî cureyê herî kêm tê strandin an jî hilberandin e.

Mijara destanan li ser qewimîn û evînên dîrokî ye. Ev stran yanî destan bi saetan heta

bi rojan didomin. Weke "Destana Memê Alan", "Keleha Dimdimê" û hwd.

**Serêlî**

Stranên Serêlî jî mîna stranên pehîzokan in. Mijara serêliya piranî li ser evînê ye, lê carcaran şer û evîn, bêrîkirin û evîn, xerîbî di heman stranê de bi hev re tên jiyîn.

**Jînegeriya Cemalê Mihê**

Dengbêjê navdar ê herêma Botanê û mîrê peyîzokan Cemalê Mihê, di sala 1957'an de li gundê Xaniyê Kalo ku girêdayî Şirnexê ye ji dayik bûye ji Eşîra Batuyan e. Ew neçûye dibistanê.

Li Şirnexê cotkarî û karê xwedîkirina heywanan kiriye. Ew di 13 saliya xwe de zewiciye û 9 zarokên wî hene. 38 salan bi zaravayê kurmancî dengbêjî kiriye.

Bi dehan stran û kilamên herêma Botanê straye û gelek klîb çêkirine. Li gelek dîwanên dengbêjan cih girtiye û beşdarê gelek konser û bernameyên TV'an bûye.

Bavê wî li herêma Botanê zirnebêjekî naskirî bûye.

Di 6-7 saliya Cemal de bavê wî jê re xeremafonekê kiriye. Bi piranî guhdariya Mihemed Arif, Hesen Cizîrî, Seîd Axa, Ehmed Axa, Îsa Berwarî, Evdilezîzê Leşker û Eliyê Firamez kiriye. Ewilî di bin bandora Mihemed Arif, Hesen Cizîrî û Îsa Berwarî de maye. Di sala 1973'yan de ji bo karwaniyê diçe Zaxoyê û banda xwe ya yekem li Zaxo, li malekê dagirtiye. Di 1991'ê de çûye başûrê Kurdistanê cem Îsa Berwarî, lê nabêje ez Cemalê Mihê me. Cemalê Mihê ku nexweşîna pençeşêrê lê peyda bûbû, ji kezeba xwe emelyat dibe. Piştî nexweşiya wî giran dibe, ew dibin nexweşxaneya Dewletê ya Şirnexê û tê tedawîkin. Li nexweşxanê bi şewba Covîd-19'ê jî dikeve. Ew dibin nexweşxaneya Amedê û mixabin li vê derê 18'ê vê mehê jiyana xwe ji dest dide. Malbatê û hezkiriyên wî termê wî ji Amedê birin li bajarê wî Şirnexê veşa

## Antîgonî sofoklîs ji weşanên Avestayê derket




Pirtûka Antîgonî Sofoklîs ku ji aliyê Tahirxan Giravî ve ji zimanê yewnanî hatiye wergerandin, ji weşanên Avestayê derket. Ev pirtûk trajediyeke ji klasîkên Yewnanistanê ye ku beriya 2 hezar 500 salî li Yewnanistana kevin hatiye jiyîn. Pirtûk ji 112 rûpelan pêk tê. Avestayê bi van gotinan danasîna pirtûkê kiriye û li ser berga wê bi cih kiriye:

Te xêr e? Xuya ye derdekî te heye, ka bêje! Erê, qey tu nizanî Kreon ferman daye ku ji her du birayên me yekî bispêrin axê û yê din nespêrin. Weku dibêjin, Eteoklîs bi dadwerî, li gor rê û resmê olî bi nirxên şahdetiya ku şehîdan dikevin binax kiriye da ku birûmetî û serbilindî here welatê miriyan. Lê ferman daye ku tu kes termê Polînîkîsî ku bi birînên xedar bêcan mayî nesipêre axê û jê re şînê negire!


Mîna kelaxekî mirdar ser rûyê erdê bêgor bimîne, bibe nûşî canê teyr û tûrên, seg û gurên dirinde ku çavbirçî û har ji sibê heya êvarê li xwarinê digerin." Axaftina navbera du xwişkan, Ismînî dipirse û Antîgonî dilê xwe vedike.

Ev tragedyaya ku 2 hezar 500 sal berê li Yewnana Antîk hatiye nivîsandin, vêga li Kurdistanê, welatê miriyên bêserûşûn konê xwe vedide. Kurdiya Antîgonî îthaf e ji Dayikên Şemiyê û wan miriyên bêkêl û gor re. ***STENBOL***

## Îlyanê dîsa dest bi weşanê kir

Kovara Îlyanê ya bi taybetî li ser çîrokên biyanî, piştî sê salan careke din dest bi weşanê kir. Kovar bi zaravayê soranî, kelhûrî, kurmancî tê amadekirin.

Di havîna sala 2015'an de kovara Îlyanê bi 118 rûpelan dest bi weşanê kir. Heta sala 2017'an 6 hejmarên kovarê hatin çapkirin. Piştre ji ber rewşa xerab a aborî, weşandina kovarê hat




rawestandin. Xwediyê kovarê bi xwe xerca çapê dida û parvekirina wê jî li ser milê wan bû.

Xwediyê kovara Îlyanê Aram Semîn ji Rojnewsê re axivî û wiha got; "Piştî sê salên rawestandina kovarê ya ji ber rewşa darayî, wê hejmara nû ya kovara Îlyanê were weşandin. Wê bi bername û planek nû dest bi weşana xwe bike û wê projeya me berdewam bike. Kovara Îlyanê li ser du astan kar kiriye. Ji wergera çîrok, mijaran û çîrokên hemû zaravayên kurdî pêk tê."

Aram da zanîn ku di kovarê de bi 9 zimanan; fransî, îngilîzî, swêdî, rûsî, erebî, farisî, spanî, tirkî û almanî werger hene. Heya niha nêzî 400 çîrok ji bilî gotar û hevpeyvînan hatine wergerandin.

Aram Semîn der barê hejmara nû ya kovarê de got; "Niha hejmara 7'an a kovarê de çîrok, hevpeyvîn û lêkolîn hene. Di rojên bê de wê kovar bigihîje pirtûkxaneyên rojhilat û başûrê Kurdistanê." ***SILÊMANÎ***

## Çapa duyemîn a 'Dîroka sar hêviyên germ' derket

Romana Veysî Ulgen ya bi navê 'Dîroka sar hêviyên germ' bi çapa xwe ya duyemîn ji weşanên J&J derket.

Nivîskar bi danasîneke wiha behsa vê berhema xwe dike û dibêje: Carinan mirinên binê bodromê bang lê dikirin, da ku dîsa xwe berde binê deryayê.

Di binê deryayê de cara yekemîn ji Pasûrê heta Cizîrê geriyabû. Li derên dinê bigeriya wê nikaribûya ji binî wî barî rabûya û derketa jorê. Jiyana wî bi tenê li her du navçeyan derbas nebûbû.

Hat bîra wî di rûniştina derûnî de bodrom hatibû ber çavên wî. Hêza xwe kom kir, li pêlan xist. Riya wî di nav deryayê de hêdî hêdî diqediya.

**Berhemên din ên nivîskar:**


* Kevirên Şewitî | Hêviyên Bakur -I (Roman-Kurdî), Weşanên J&J, 2018 - Amed

* Razên Şîn | Hêviyên Bakur -II (Roman-Kurdî), Weşanên J&J, 2019 - Amed

* Berfa Sor | Hêviyên Bakur -III (Roman-Kurdî), Weşanên J&J, 2020 – Amed

* Dîroka Sar Hêviyên Germ – Çapa 2mîn (Roman) Weşanên J&J, 2021 – Amed

Her wiha gelek berhemên din bi zimanê tirkî nivisandine. ***AMED***



xwebûn

25-31 Çile 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 58

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:***
Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:***
İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:***
Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli

***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85

# Duriyana dîrokê: Herran



Keştiya Alalû
Agit Yazar

Gava dibêjin Herran, tenûra himhimî, havînên zer-kizirandî, erda qemirî ya terk terkî tê bîra mirov. Rûyên mirovên qemer, yên qermiçandî, dev û rûyên bideq, yên raza dîrokê di xwe de dihewînin tê bîra mirov.

Rawestegeha pêxemberan, malvoniya ji gerokan re, baregeha ji artêşan re û rêpêxistina bazirganan tê bîra meriv.

Geh şîrqeşîrqa şûr û mertalên artêşên giran, geh xingexinga zengêlên refên kerwanan, geh jî qiçeqiça roja havînên sincirandî, her û her di guhê beniademiyan de kiriye zingezing û zingînî ji guhê min jî hat. Niha dor hat êdî ez zingîniya di kerika guhê min de olan dide, ji we xwînerên ezîz re rave bikim. Te dît, bi qasî zanebûna xwe!

Gava em dadigerin nav sûrên Herranê, colek zarok derdikeve pêşiya me. Zarokan em xistibûn dorpêça xwe. Nola masiyên gola H.z Îbrahîm. Gava mirov kulmek dan davêje navê, çawa xwe di ser hev û bin hev re dikin, aha wan zarokan jî wanî dikirin xilexil û xwe di ser hev û bin hev re dikirin. Edetî mirov dixistin nav fikaran. Tam di wê hênê de, texsiyek toros ber bi me ve tê. Ajokarê torosê, xwe li kelîkortên çolbeyariyê dixist û dihat. Rebena torosê dilicimî û hildipekiya. Te yê bigota qey bi hêlingokê dilîst. Toros hat got zinq, li ber me sekinî û bi nuqurçik stop kir. Gava zarok çav li ajokarê texsiyê dikevin, dibin nola noka li kevir û her yek bi deverekê de direve. Paşê ajokar, me difermîne binê kon. Konê reş ê nizanim çendik û çend stûnî. Kon, li ber avahiyên kovikî yên Herranê hatiye vegirtin. Em jî qehweyek tahl a mirra vedixwin û em dest bi gera xwe ya li Herrana qedîm dikin.

**Wateya navê Herranê**

Bajarê Ebla yê antîk, li herêma Idliba Sûriyê ye. Gava arkeologê îtalî yê bi navê Paolo Matthiae di sala 1974'an de li vî bajarê antîk ê Eblayê dest bi kolandina arkeolojîk dike, li arşîveke şaristanîya Someran a dêwasa rast tê. Arşîva derketibû li ber ronkahiya rojê, ji hezaran keval/tablet pêk dihat. Kevalên derketibûn, dîroka wan entegreyî 4250-4500 sal beriya niha dikir. Wan kevalan, dîroka gelek tiştên nedihat zanîn aşkera kiribûn. Navê bajarê Herranê jî di wan kevalan de hatibû nivîsîn. Navê Herranê bi nivîsên mîxî, wekî Hara-an, Har-ra-na û Heran-û hatibû nivîsîn. Ev navên hanê yên bi Somerî dihat wateya "kerwan, rêwî, duriyan..." Navê Herranê, bi hişmendiyeke kurdî, motacî lêkolîna etîmolojiya wateya wê ye.

Lewra bi dehan peyvên kurdî yên nêzî vî navî hene. Jixwe êdî hatiye piştrastkirin ku Somerî jî qewmekî zagrosî ye û baskekî ji pêşiyên kurdan e. Lema jî gelekî xwezayî ye, zimanê Somerî li zimanê kurdî rûnê.

**Em Herranê ji nêz ve binasin**

Herran, di cîhanê de kêm ji wan bajarên ku hîn jî şên û ava ye. Ango hîn û hîn jî cih û meskenê benîademiyan e. Niştecihên Herranê, ji sê pa jê dudu ereb, payek jî jê kurd in. Gelê ereb, hema hema tevdek li derdora 250 sal berê, bi mebesta guherîna demgrafiyayê, ango erebkirina erda kurdan, Osmaniyan ew anîne li Herranê bi cih kirine.

Heta niha kolandineke arkeolojîk a bi rêk û pêk nehatiye kirin. Lema jî digel avakarên vî bajarê dîrokî baş nayê zanîn jî, lê dîsa tê texmînkirin ku ji hêla pêşiyên kurdan ve hatiye avakirin. Lewra dîroka Herran tê de hatiye avakirin, di wê demê de tenê pêşiyên kurdan yên wekî Hûrrî/Xorrî-Mîtanê li vê herêmê dijiyan.

Sûrên bajarê Herranê, derdora 4.5 dirêj in û ji 187 bircan pêk tê. Bi qasî tê zanîn, şeş deriyê wê hene. Navê van deriyan wekî deriyê Bexda, Reqa, Mûsil, Rom, Heleb û deriyê şêr tê zanîn.


Di nav sûrên hilweşyayî de, kelehek heye. Kevirên vê kelehê, miqîm ji şikeftên Bazdayê enîne. Ev şikeftên Bazda, derdora 15 km dûrî Herranê ne. Di rewşa xwe ya niha de, artêşek dikare li gel tanq û topên xwe, xwe tê de veşêre. Ew qas dêwasa mezin in.

Şopên gelek şaristaniyan li vê kelehê tê dîtin.

Di nav wê kelehê de, avahiyên wekî, perestegeha Sîn-Samaş heye. Girêdanek çawa di navbera Sîn-Samaş û Mîtra de heye, ev yek motacî lêkolînê ye. Lê li gorî ev dever navenda hukumdariya pêşiyên me yên Mîtanî ye û tê zanîn Mîtanî û Hîtîtiyan bi hev re peyman girêdane. Di vê peymanê de, bi navê mezinahiya Mîtra sond xwarine.

Wekî dîn hemama di serdema Romayê de hatiye avakirin, kaniya dîrokî û tunel hatiye dîtin. Ev kaniya dîrokî, dişibe kaniya medreseya Qasimîyeyê ya li Mêrdînê.

Şêweya avakirina vê kaniyê, jidayikbûna mirov û mirinê sembolîze dike. Ev sêwirandina hanê ya niwaze, aydê dahênerê/mûcîdê kurd, Ebûl-Îz El-Cezîrî ye. Ebûl-Îz El-Cezîrî yê Kurd, di cîhanê de tekane mûcîd e ku cara ewil wî robot û alavên xwe bi xwe dixebitin çêkirine. Divê neyê jibîrkirin ku ev mûcîdê kurd, ji Leonardo Da Vîncî re bûye îlham.



Her wiha di nav avahiyan de, li ser tahtekî xêza lîstika bi navê "mang'qelê" jî hatiye dîtin. Ev lîstik, li vê herêma Rihayê di demên kevanar de gelekî berbelav hatiye lîstin. Tê gotin ev lîstika hanê, xwedî stratejiyeke xweser e û dayika lîstika dame-kişik tê hesêb.

Navê lîstika "mangqelê" di nav destana Dewrêş û Edûlê de jî derbas dibe. Di destpêka destanê de, dengbêj wiha dibêjin: ...Edûlê ji Dewrêş hez dike. Dewrêş jî ji Edûlê hez dike. Lê kesek pê nizane... Rojekê Dewrêş û Çiloyê Îzolî bi hev re bi lîstika mangqelê dilîzin. Dewrêş, halanekê di xwe hildide dibêje, ez kilê çavê Edûlê me!... Çiloyê Îzolî jî yeka xwe dibêje...

Destan, bi van gotinên dengbêjan yên lihevhatî wanî berdewam dike.

Hêjayî gotinê ye ku dera ev destan lê hatiye gotin û Herran bi ser heve ve ye. Di navbera wan de 100 km an heye yan na.

**Sultan Silhedînê Kurdî li Herranê ye**

Her çiqas beriya siltan Silhedînê Kurdî, şopên Emewiyan li Herranê tê dîtin jî, lê esil Silehedînê Kurdî mora xwe li bajarê Herrana dîrokî dixîne.

Gava siltan Silhedînê Kurdî dixwaze Amedê ji destê Begê Artûkî derxîne, tê li Herranê bi cih dibe û pilansaziya vegirtina Amedê li Herranê dike.

Siltan Silhedînê Kurdî, bi şêwirmendê xwe yê zîrek û zanamend, Mele Îsayê Hekarî û mîrên kurdan, zivistana xwe li Herranê derbas dikin. Bi derbiharê re vedigerin Amedê û bajarê bav kalê xwe, ji destê Artûkiyan rizgar dike.

Bi vî awayî serdemeke nû ya Eyûbiyên ji eşîra Rewdiyan ku ev jî yek ji wan eşîrên kurd e, dest pê dike. Di vê serdema nipînû de, gelek avahiyên nuwaze jî tên avakirin. Yek ji wan avahiyan, lêzêdekirina hinek beşan li zanîngeha Herranê ye. Her wekî tê zanîn, ev zanîngeha Herranê, li gel zanîngeha Nisêbîs/Nisêbînê di cîhanê de wekî zanîngehên yekem tê zanîn. Hîn jî gelek beşên vê zanîngehê li ser piyaye. Nexasim jî lûla wê ya çavdêriya raçavkirina liv û tevgera stêrkan, ango lûleya resetxanê, di wexta li ser hemd û hêla xwe bû, 70 metre bilidahiya wê hebûye. Di roja me ya îro de jî, hîn jî beşeke ji 33 metreyan li ser piyaye. Tê zanîn ku gelek şagirtên paşê bûne feylosof û alimên zanistê, di vê zanîngehê de perwerde bûnin. Paşê ev feylosof û alimên zanînê, berhemên feylosofên girekan li zimanê erebî werdigerînin û di pêşketina felsefeyê de, dibin xwedanê risteke mezin.

Di serdema siltan Silhedînê Kurdî de, Herran jî nola gelek herêmên din, serdema xwe ya zêrînî dijî.

Ji sûra Herranê jî tekane deriyek zexm maye li ser piya. Ew derî, deriyê hêla Helebê ye û ji birayê Silhedînê Kurdî re hatiye nezirkirin. Li jora derî kîtabeyek tê dîtin. Li ser kîtabeyê nivîsiye, El Melîk El Adîl. Adîl, navê birayê siltan Silhedînê Kurdî ye.

Jixwe ji navê xwe jî gelekî eyane ku ev binemala kurd, gelekî adîl bûne. Ew çend mêrxas, xwedî edalet û adîl bûne, heta neyarên wan jî ji wan re rêz girtine. Mêrxasî û edaleta siltanê kurd û birayên wî, bandoreke mezin li ser xaçsorên ku siltan Silhedînê Kurdî ew efû kiribûn û ew şandibûn welatê wan Ewropayê.

Bêgoman Mele Îsayê Hekarî, di kemilandina siltan Silhedînê Kurdî ye, xwedanê risteke bêhempa ye. Mixabin ev zanamendê zîrek, heta niha bi qasî heq kiriye, ji hêla Lurdan ve nehatiye naskirin û şerefyarkirin.

Xwînerên ezîz. Di vê xelekê de heta ji min hat, min şopên pêşiyên me ji nav şopên miletên din da alî û pêşkêşî bala we kir.

Herran bajarekî werê ye, li ser devê duriyana hevirmêş a dîrokî ye. Lewma jî di nav demajoya dîrokê de, her buhustek erda wê, di bin simên hespê barbaran de hatiye vestrandin. Heke ez qala van şerên li derdora Herranê qewimiye bikim, cih di rûpelê de namîne.

Berdewama şer û cengên dêwan, di beşa tê de ye... ***(didome)***



